

"Dolab behs e,
teşî reqs e, nexş
hewes e."

ARMONÎKAYA HÊŞÎN

roman

Cîhan Roj

"Aniha, her carî destê xwe dixim dilê xwe û tişteki jê derdixim... Çîrokeke ew qas kurt e çîroka min..."

Cihan Roj, di sala 1965 an de, (di qeyda fermî de 1964) li gundê Înaqa Gimgimê tê dunyayê. Dibistana seretayî li gund, ya navîn û lîse li Gimgimê xwendiyê. Despêka bi kurmancînivîsana wî 1993 ye. Di heman salê de helbest û çîrokên wî têne weşandin. Di salên du hezarî de ew hinek termên matamafîgê diafirîne û ji Enstituyê re bi rê dîke. Ew xebat di sala du hezar û şeşan de, di Azadiya Welat de tê weşandin.

Nivîskar ji sala 1993 yan heya sala 1997 an li Mêrdînê, li sendîkaya kedkarên qada perwerdehiyê, wekî sekreterê perwerdehiyê rêveberî dîke. Di sala du hezar û yekî de, bi pêşniyara wî, li Îzmîrê, 'Konferansa Nivîskaran' tê lidarxistî. Li dû konferansê, ew qerar digire û bi tenê bi edebîyatê re mijûl dibe. Dîwana wî ya ewil "Ratîka" di sala 2002 an de çap dibe.

Di gellek malper, rojname û kovaran de, nivîsên wî têne weşandin. Demeke dirêj di malpera "diyarname" yê de qunciknivîskarî dîke. Nivîskar hê di malpera "toterwinkel" de qunciknivîskarî dîke.

Nivîsên wî bi navê "Edebîyata Modern A Kurdî" di sala 2019 an de bi awayek dijîtal hate weşandin. Romana wî "Perde" bi navê "Mahrum" bi tirkî derçû. Bi tevî mishefa derheq Cîgerxwîn de hatî weşandin, di mishefa bi navê "Kawayê Min" de û di mishefa kurteçîrokan a ji hêla Şaredariya Amedê ve hatî çapkirin de ew jî yek ji nivîskaran bû.

BERHEM:

1. RATÎKA, helbest, 2002, Weşanxaneya Sî, Stembol
2. MEYMAN, çîrok, 2006, Weşanxaneya Lîs, Amed
3. AQIL DIÇE SEWDA DIMÎNE, çîrok, 2008, Weşanxaneya Do, Stembol
4. DERIYÊ ÇÎROKÊ, çîrok, 2008, Weşanxaneya Do, Stembol
5. GÎTARA BÊ TÊL, roman, 2009, Weşanxaneya Do, Stembol
6. MEŞA MORIYAN, roman, 2001 Weşanxaneya Evrensel, Stembol
7. PERDE, roman, 2012, Weşanxaneya Na, Îzmîr
8. SEHNE, çîrok, 2013, Weşanxaneya Yekitiya Nivîskarên Kurd Tayê Duhokê
9. SERKÊŞ, roman, 2014, Weşanxaneya J&J, Amed
10. HURCAHIL, roman, 2015, Weşanxaneya J&J, Amed
11. REŞ, roman, 2015, Weşanxaneya J&J, Amed
12. MALA BAZ, roman, 2018, Weşanxaneya J&J, Amed
13. AV Î BERF, hemî helbest, 2018, Weşanxaneya J&J, Amed
14. EDEBÎYATA MODERN A KURDÎ, Adar 2019, bi awayê dijîtal, malperên diyarname û çandname.

ARMONİKAYA HÊŞÎN: *Cihan ROJ*

roman

Hemî maf parastî ne. Ji malpera Diyarnamêyê ketibe, bêyî destûra nivîskêr a nivîskî bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê weşandin.

Meha pêşî a sala 2020 an.

"Şer nanivîsînîm, mirovê di şer de dinivîsînîm.

Ne tarîxa şer, tarîxa hest.

Dîrozkana ruh im.

*Li hêlekê, mirovê ku di zemanekî kifşkirî de jiya ye, mirovê tevî hin bûyeran bûye lêdikolim,
belê, lê li hêla din gerek ez mirovê edebî yê di wî de bibînîm.*

Lerizînên edebî. Tişta her wext di mirov de tê dîtin."

Svetlana Aleksiyeviç

"Dolab behs e, teşî reqs e, nexş herwes e."

Ji folklorê kurdî

Fesîh ev hevokên li kaxizê xwendin:

"Tiştekek bi serê mere de hat, meriv bibe hêsîrê wî tiştî, îş zor e! Ditirsim çîroka armonîkaya hêşîn mi dîn bike!

Piştî Polîşanê bi Fesîh ve bû, bi heyranî û rûmeteke mezin, wêneyê Prensesa Kurd Leîlayê li ser sehpe bi cî dikir. Got:

-Hêsîrbûn zor e canê, rewşa tu tê de ji hêsîrbûnê jî girantir e, tu çîrokên xwe bi bîr tînî, vedibêjî, ez di wan çîrokan de trajediyên hêsîrên li ber destê hêsîran dibînim... Hêsîrbûna li ber destê hêsîran hê zortir e. Hêsîr wexta li ber destê hêsîran in, derî û şibakeyên hiş û dilê xwe dadidin, ji xwe re nav li wê dunya bêy derî û bêy şibake dikin êdî qebûlkar in, ger û lêgerînê hew heya qebûlên xwe dibin.

Li xwe mukir were êdî, tu bûyî hêsîrê çîrokên hêsîrbûnê; armonîkayê ji zû de dev ji te beredaye, tu dev ji armonîkayê û ji çîroka armonîkayê bernadî!

-Mi ew hevok bo bloga xwe li kaxizê kir. Ji xwendina bideng, mi jî nizanî ez dixwazim çî bi dest bixim!

-Çi xweş bû te bi deng xwend.

-Sipas dikim... Ha, fotografê aşê avê, te ew fotograf xweş amade kiriye. Di blogê de balê dikişîne.

-Mi bi kêfxweşî serê xwe pê re êşand. Em her wisa li hev zêde bikin.

-Kêfxweş im...

-Ez jî...

-Blog dibe sebeb her peyv an jî çîrokên li ser dilê mi rûniştî, weke çûkên ji qefesê bifilitin, fir bidin...

-Ciyê kêfxweşiyê ye.

-Blog wê derfetê dide mi, mixabin wexta nivîsek nayê xwendin wê wextê jî dibe sebebê êşkencê...

-Weke deftereke rojnivîskê a şexsê xwe bihesibîne, bi bendewarî tevnegere!

Fesîh bêdeng ma.

Her du jî li hev miqate bûn, hay ji hev hebûn bê çiqas fêdekar, xweşzar, hestiyar û diltenik bûn hewqas jî zû li xwe digirtin, Polîşan, bo blogê, bi xweşbîn û bi hêvî bû li alî din jî hin kêmanî didîtin, sebir dikir, dihişt paşê, bê ka çi biqewimiya...

Bloga ku Fesîh ew saz kiribû ji bo Fesîh xebateke muhîm bû. Polîşan di bikaranîn û saz kirina resim û fotografan de alîkarî dida wî. Blog bo şîroveyan girtî bû. Polîşan bi şîroveyên xwe alîkarî dida Fesîh.

Polîşan:

-Bo ew halê kêfxweş berdewam be, armonîkayê niha ji bîr ke...

-Gotin rihet e!

-Di dewsa wê de tiştêk din bîne aqilê xwe...

-Madem wisa rihet e, tu bêje, ka tuyê ji mi re çi bêjî?

-Bîne ber çavên xwe, çiyayên bi heybet, zinarên asê, tu li ser zinarek ez li ser zinarekî din, ez dibim teyrek xerîb, deng, tuyê dengê armonîkaya hêşîn ya di hiş û ruhê xwe de bibihîzî ez jî dengê kilamekê, dans; ez ê bi şev û roj li wir dans bikim! Em her bi xeyalên wisa re bin, herûher...

-Ne nîyet kiriye, tuyê dîsa me bibî nav xeyal û xeybaneyan... Baş e, ka em pê de biçin; li wî ciyê, ez ê gotinên Medeîayê biqîrîm:

"Lawên min, dînbûna bavê we hûn mehf kirin."! Pey re biqîrim. Armonîkaya hêşîîn!
Tu li ku yî? Were, ez dengê te bibihîzîm!

-Te bêyî mi mishef xwendin e, mi Medeîa nebihîstibû!

-Lehnegeke mîtolojîk e... li sahafê mi rastgele rûpelên ferhengêkê qulubandin, çi tesadif e, ew xal derket pêşberî mi...

-Dîntiya bavan... Îcab nake kubar tevbigerim, tiştên wisa bala mi nakişînin... Li Fesîh nihêrî, pê de çû. Lê tiştê ku ji bo merivan bibe sebebê qêrîn e helbet niha bi çîrokên bi seyr e, amade me guhdariya te bikim.

-Jiyan ji bavên dîn neditirsiya li wî welatê sor, welatê sor mîna agir, welatê sor mîna çavên sor, sor mîna xwînê, sor mîna rengêk ji rengê rojê... Çimkî, çimkî Polîşan jiyan li wir dînuhar bû! Mêr dişibiyar birûskê, di hêrsbûnê de dibûn lehî, dibûn ba û bager, piştî wextekê jiyan li wan dibû agir û ew diheliyan, piştî helînê dibûn zarok, dibûn ...

Polîşan:

- Meriv li bendê ne gotinên te mîna karê terzîtiyê bi pîvan, sade û net bin, tu weke li ser dikekê bî diaxivî...

-Di ferqê de me, kêlî hene dicoşim, wisa ku xwe di halê "mêrek"î de dibînim, lê werdiqilim, bi wî halê xwe yê bi coş dikenim...

Rengê dengê Polîşanê guherî, wisa, hewes dikir wê kêliyê li ser dikekê ba:

-Bêje, xwezî ez jinbûma! Mêrê dîn, bavê dîn, xortê dîn, paşayê dîn, serbazê dîn...
beranê dîn, hespê dîn, gayê dîn... Ev çi ye... Jiyan ne dînûhar e, a ew jiyane dînûhar
dikin!

Fesîh pê de neçû, weke zarokek kevir biavêje holika ji qirşikan hatî çêkirin, gotina ku
Polîşan wê kêliyê ne li bendê bû got:

-Armonîkaya hêşîn...

Polîşan ji nebihîstî ve hat:

- Soz be ez ê jî dans bikim, danseke sor! Û di kêliya dansê de ez ê dayikekê bînim ber
çavên xwe; dayik direve, dêwek li pey wê ye, ew direve dêw nêzikahî lê dike... Ez ê
di navbera wê û dêw de bibim aravî, gur bim, gur bim, gur bim û hil bim...

Ber bi dîwêr ve meşiya Polîşan. Li fotografê bavê xwe nihêrî, got:

"Bavê min digo, heke ji me dengêjan nebûya herçî heyata hebû jî wê bêlezetbûya...
Xwezî niha li vir bûya, ji me re kilam bigotana... Kalikê min, heke aniha li vir bûya ê
ji me re bigota, 'ka bi destê hev bigirin ez resmê we çêkim'.

Birayê wî rojekê jê re got, di resmên te de hezkirin hew bi şiklekî ne, temas, destê
însanan di destê hev de ne, herçî teyr û çivîk in an nikulên wan nêzî hev in an jî
baskên wan bi hev ve ne... Mamê bavê min Pir ji min hez dikir. Ji tirsê wî nikaribûm
rûniştima, digo, 'rabe, bireve, bilîze, li ser kevir û daran bimeşe'. Diya min bi dengêkî
bi gazine digotê, wê bikeve, tiştêk were serê wê. Wexta em ji havîngehê vedigeriyan,
di nav sikakan de ez ne distirîm. Rojekê mamê bavê min yê felsefevan got, keçikê
bişînin kursa baleyê. Bavê min di devê xwe de bir û anî, dengê xwe nekir."

Bapîrên Polîşanê di dema Osmaniyan de malbateke paşazade bûne. Di salên 1921 î
de tene sirgûnkirin. Zarokên wan di dibistanan de serkeftî ne. Bi demê re zimanê
xwe ji bîr dikin. Malbateke sekuler in. Pismamê bavê wê bi felsefeya edebîyatê re
mijûl dibe. Polîşan li ser piyan serpehatiyan li hev zêde dike.

Wexta ji dîwêr dûr ket bi bişîrîn diaxivî:

-Mamosteya mi a kursê koçbereke Mîdîlîyî bû. Wexta behsa xwarinê dikir bi heyecan
bû, ez, digot, bi meş diçim firinê, marketê, bazarê, taştêyeke xweş çêdikim. Navrojê
sifra min ji pelûpincarên cuda kê mabe. Piştî kursê diçim mal, şerabê vedixwim,
mûzîk, mûzîk mi serxweş dike. Li mi dinihêrî, bi bişîrîn digo, Polîşan, niza tu xwe
çawa hîs dikî li kesê bi mi re be divê bo dîmena berêvarê amade be, eşq, eşq dişibe
wê dîmenê ku meriv bi dansa xwe tevli dîmena berêvarên warê Îlyada û Odesîayê
dibin!

Fesîh hatibû, li cem wê rûniştibû, ka em weke di resmên kalikê te de bi destê hev
bigirin, got, destê Polîşanê mist da.

Derengî şevê bû. Fesîh bi têlêfonê çend fotografên armonîkayê kişandin, ew avêtin ser kompîtorê. Ji Polîşanê re got, sibehê ez te şiyar nakim, piştî taştê diçim sahafan. Tuyê bikaribî ji wan fotografan jê yekê biavêjî ser blogê?

-Baş e. Bo bloga xwe diçî?

Ç i di serê Fesîh de hebû jê re got, 'wextek e ti feydeya min nagihije te, derheq dansê de mishef hebin ez ê bikirim bixwînîm, bi wî awayî hem karibim bi te re sohbet bikim hem jî bo blogê ê fersend bikevin destê min.

-Tu dikanê îhmal nakî, ne?

-Na.

-Baş e. Sibe ez ê biçim kontratên dikanan îmze bikim. Heqê kirê bigirim û biçim li qumaşan binihêrim.

-Baş e.

Polîşan çûbû oda xebatê. Fesîh di nav nivînan de bû, gotinên derheq alîkariya ji bo Polîşan ew aciz dikirin, xwe weke kesek durû didît, xwêdan pê diket.

Rabû, pencere vekir, ji bahrê de hewa hênik dihat. Henaseyên kûr kişandin li ser hev. Pirs ji xwe dikir, heke Polîşan biba keseke meşhûr ê çibûya? Ji rewşeke wisa re amade bû an na? Ditirsiya. Carna diket halek wisa, li ku bû ê hewl bida dansê weke karekî nebaş nîşanda. Baş dizanî hewl û fikrên wisa ê bibûya sebeb Polîşan wî biqewirîne!

Dengê dibihîst... Xeyalkirina dengê armonîkayê ew ji fikrên wisa dikir. Li ber çavên wî şiklên armonîkayan diçûn û dihatin. Nedixwest ew dîmen ji ber çavên wî biçê. Qey dixwest her dengê armonîkayê her bibihîze, xwe li wî gelîyî didît, hewayê hênik, asîmanê çiksayî, ew li şaneşînê bû, bi dengê armonîkayê re wî li pêş malekê dinihêrî, li wir yara wî li hîvê dinihêrî... Roja mayî, sibeh zû, kesê li armonîkayê dabû hatibû mala wan, ew ê pev re biçûna terzîxaneyê, gomlegêk di rengê hêşînê tarîda jê re bidirûta.

Ber bi navenda bajêr ve meşiyabûn. 'Saray Camî' a bi halê xwe. Qederekê meşiyabûn, li milê rastê 'Haci Şeref Camî', bi qasî pêncî-şêst mêtreyî durî wê, 'Ulu Camî', hinek din meşiyabûn li bakurê wê, bi qasî sed metreyî dûr, 'Alaaddin Bey Camî', li Nezmî vegeriya bû, gotibû, serê gavê mizgeftê... Nezmî, qey yekî xwestiye camîya wî ji yê din xweştir û binavtir be lewma li heman ciyî hewqas camî hatine avakirin, gotibû.

Du roj beriya eydê bû. Kolan bi 'cilên xelkê yê kevn'ên li ser destan, bi tirkî jê re "Bit Pazari" dihat gotin, dagirtibû. Dengê malê erzan bilind dibû li goşê bazarê. Xwe li rêya 'halê girtibûn. Nîv kîlo xiyarên 'Kanîreş'ê kiribûn. Li dû taştê, Fesîh gomlegêk bi dilê Nezmî dirûtibû, di wê navberê de derheq armonîkayê de, sewt û dengê şevê de sohbet kiribûn.

Rewşa şer a salê nodî bo wan jî bûbû mijar. Nezmî gotibû, tu dixwazî wextekê eleqa xwe ji min bibire, tê gohê min, her kes tiştêk bo min dibêje, heke meriv bi ser zarûzimanan ketin, çî rast çî derew, di şer de, bi awayek bela tê serê merivan!

Fesîh, em hevalên hev in, guh li kesê meke, ez te nas dikim, gotibû, rengê li wechê wî ne rengê wan gotinan bû, di wê esnayê de, carê du caran ji derziya ku li tiliya xwe xistibû veceniqîbû...

Wê şevê, bi tevî Nezmî du kesên din di geliyekî de hatibûn kuştin, ew weke kesên "kujerên wan ne belli" hatibûn binavkirin. Fesîh piştî kuştina wan bi sê rojan, terka welatê xwe kiribû. Bi salan bû pirsê wê armonîkayê dikir, her bi hêvîbû ê rojekê ew armonîka bidîta!

Elînewêrek ji min wêrektir bû, gote xwe.

Polîşan ket odeyê, tu hê ranezayî, got.

-Xewa min nayê!

-Were odê!

-Na, tu rihet bixebite!

-Baş e canê!

Çi kêfa wê dihat wexta Polîşan bi dengê bi newa, jidil jê re digot, 'canê!', rabû, çû ber pencerê. Ji ber ku gotinên hezkirinê ji devê wî dernediketîn xemgîn dibû, her ku gotin dihatin ser devê wî ew dadiqurtandin, li çavên Polîşanê dinihêrî, li bendê bû ew nihêrînên wî ji alî Polîşan ve werin xwendin!

Li oda Polîşanê a xebatê wêneyên Leîla Bedirxanê hebûn. Nûçeyên derheq Leîlayê de hatibûn çarçovekirin ew jî daliqandî bûn, li her dîwarî fîgûreke dansê a Leîlayê ku Polîşan ew fîgûr li gorî xeyala xwe saz kiribû, bi qelesa reş çêkiribû. Bi wî awayî, Polîşan di kêliyên xebatê de, li kîjan dîwarî binihêriya Leîlayê didît. Ketibû rewşeke wisa ji sekn û nihêrînên Leîlayê ji mehne û şîretê bêhtir heyranî lê zêdetir dibû. Sekna şêr, digot bo fotografekî Leîlayê. (Ji malbata xwe, biwêja şêr şêr e çi jin e çi mêr e, bihîstibû, bo wê Leîla weke îspata wê biwêjê bû.)

Heyraniyeke wisa bû a Polîşanê, ji ber heyraniya xwe a bo Leîlayê ew û mêrê xwe yê pêşî gellek caran gengêşî bûn, li pey gengêşîyan carna pevçûn derketibû. Carê jî şerekî no di navbera wan de qewimîbû.

Mêrê wê yê ku çepgirek neteweperest bû, her cara sohbet hatiye ser dansa Leîlayê, wî, bi navê rexneyên sîyasî, gotinên ne baş derheq cihuyan de kirine, nîyet ji rexneyan pergala rêveberiyên cihû bû an bi gelemperî hemî cihû bûn, ne wî kesî îfade dikir ne jî Polîşan pêdivî pê ditîbû bi pey detayên wisa bikeve, her mijar hatiye ser serkeftinên Leîlayê mêrê wî hewl daye derheq emperyalîzmê de fikriên xwe heta carinan kompoyên gellek balkêş yên nayên aqilan anîye meydanê! Polîşan her carî bîra wî xistiye bê diya Leîla Bedirxanê cihû bûye, wisa, jê re gotiye, 'tu bi qestî li dora wan klîşe û gotinên xwe yên meşhûr diçî û tê, ev ne tesadif in, hay ji xwe hebe', mêrê wê bi a xwe kiriye. Polîşan heya derekê hewl daye mêrê xwe qanî bike bê antîsemîtîzm ne baş e, akademîsyen û rewşenbîr, erbab û esnafên cihû yên feyde gihandine vî welatî bi bîra mêrê xwe xistine mêrê wê ti qîmet li gotinên wê negirtiye.

Mêrê wê, ji ber têkiliyên bi birokrasiyê re û ji ber dewlemendiya xwe her hewl daye Polîşanê bibe ser xeta xwe, ew karibe rê bide jiyana Polîşanê. Polîşan destûr nadê, dev ji hev ber didin.

Bi saya cîraneke xwe, Polîşan hunera terzîtiya Fesîh bihîstiye. Rojekê diçe dikanê. Atmosfera li dikanê, sohbeta Fesîh bandor li Polîşanê dikan. Evîna wan bi wî awayî dest pê kiriye.

Kêm ba jî hin mirovan, jîyanê basît didîtin, jîyanê weke pêlîstok dihesibandin, weke parçên qumaş yên di destê xwe de, ji wan parçeyan şiklên wisa çêdikirin her yek jê bi nav dikirin. Wexta ji wî halê çîrokî hêşar dibû xwe di valahiyekê de didît. Bêdeng, bi sirûrazan dagirtî bû. Nihêrîna li valahiyê têr nedikir, dixwest di valahiyê werbe, kendal û zuxurên mezin disêwirî. Tirs, endîşe, qêrîn... Hestên cuda...

Ew her ku bi pey mishef, jiyana modern bikeve jî gotinên jiyana rojane, ceribên jiyane, bîranîn, tore û nêrîtan bêhtir rê dida tewr û hin fikrên wî. Gotinek ji nav jiyana rojane hat bîra wî:

"Hewqas nebe birçiyê tişta, ma zor e, tu çî dixwazî serê xwe bide ser oxira wê..." Di dilê xwe de be jî nedixwest Polîşanê sûcdar bike, xweranegirt, xwe bi xwe got, Polîşan nahêle ez serê xwe bidim ser balîfekê, rêyekê bidim pêşiya xwe, here ku tu naçî kawîs Axa... Biwêja ku bi îhtimaleke mezin xwe dispart wî dengî ku Kawîs Axa di dawiya kilaman de ew deng bi xwe dixist, bi mehneyek xwe wê dida der ku meriv ji nişka ve dipekiyan, dimeşyan. Wê kêliyê ji Fesîh hat biçê hemberî Polîşanê û bêje, bihêle bila ez û tu em bibin dêw û bav. Keçên me yên çavreş, çavkesk, pordirêj çêbin, bila zarokên lawîn her yek jê weke baz û qertelan bin, bi meş û heybeta xwe werin nasîn... Navê wan ne muhîm bû, wexta derbirînê de awayê derbirîna navan, darblêdan û rengê dengê mirovan "nav" meşhûr dikirin an jî piçûk dixistin... Wîyê hemî nav li Polîşanê bihiştana...

Fesîh li ber pencerê xwe ji wê valahiyê kir, bi serê tiliya xwe li camê da. Tibabekî bêy fikir ma, bêy pirs û xeyal ma, mîna hişê xwe bi jêbirê paqijkiribe hîs kir, hişek vikîvala. Zêde dom nekir; welatê xwe, çîroka armonîkayê, 'hawarê' bihîstibû û xwe lê nekiribû xwedî bi bîr anî. Bi nav mihesebeyeke hestiyar ket; têra xwe pere qezenc kiribûn, hewcedariya Polîşanê bi perê wî tunebû, ger bixwesta dikarî li welatê xwe vegehiya, ji bo malbata Nezmî, ji bo nasên xwe karên çêtir bikira! Xwe nexapîne, gote xwe, tu heya niha ji bo hêviyên bavê xwe jiyayî, hê jî tu bi wê hêviyêyê ku tu rojekî bendewariyên bavê xwe bînî cî, biçî ser tirba wî û xebereke xweş bidî wî...

Xwe şermezar dikir, xwe bi xwe, heba mêraniyê bi mi re hebûya, wexta bi şev dengê Nezmî carê du caran bi ser min ket, ez ê derketima derve, min ê bikira qêrîn û hawar, belkî kujeran ew nebiriba! Elînewêrek, Fesîhê Elînewêrek, minminî!

Axînekê kişand. Hin bûyer li ber çavên wî dîsa diqewimîn; piştî bûyera ku Nezmî jî tê de hatibû kuştin bi mehan şûn de dengbêj anîbûn da dengbêj kilaman biavêje ser Nezmî.

Dengbêj çewkiyekê lê dike. Bi ser nakeve. Dengbêjê rengûrû, bejnûbal, temenê Nezmî pirsî bû, navê dê û bav, xwişk û birayên Nezmî pirsîbû, bi roj li derdora cîwarê mala Nezmî nihêrîbû, hemî amadehiyên xwe kiribûn diêşe, her dike da li hev bîne tê de dimîne, mirov li wî dinihêrin. Dengbêjê ku ji gundekî Sasonê de hatibû, dibêje:

-Ez dengbêjekî çiyayî me, li wan çiyayî, bo serhildanan, bo rêbir, diz, fîrar, mêrxas, axa, beg, mîr, şerê giran, şerê xal û xwarzî, ap û birarziyan, bo derdê dilan... kilam

dihatın gotin... Ji çiyayên me de mêrxas, mirovên têkçûyî berê xwe dabûn bin xetê, kilamên li ser wan hatine gotin, ez aniha wan kilaman tînim bîra xwe, dixwazim kilama mi mîna wan kilaman be, ji we rica dikim, li xwe megirin, ez nikarim kilamekê lihev bînim!

Bavê xwe, jiyana bavê xwe anî ber çavên xwe, li xwe mukir dihat ew heya wê rojê jî ji bo xwe, bi qerarek serbestî bi hêvî, daxwaz û bo kêfa xwe nejiya ye, her gav û lehza ku tiştên wisa hatibin ser dilê wî jî 'dengê mexsedê' hatiye ji dilekî wî; 'Lê bavê te? Qey te ew ji bîr kir?' Çima mirî nedihatın ji bîr kirin? Çima 'dewûdoza' miriyan bi zindiyan redima? Prsên baş, yên bêmehne, yên tewşomewşo ji xwe dikirin...

Roja bavê wî jê re behsa Mehdî Zana kiribû bê çawa ew bûye şaredarê Diyarbekirê, mirovek çî zana û maqûl e, ji wê rojê de Fesîh hem çûbû ber destê terziyekî, hem jî xwe dabû xwendinê bi wî awayî wîyê bi mirovan re têkiliyên xweş saz bikira, ew ê biba kesekî zana. Xeyalên wî, armancên wî ew bi kêf kiribûn. Bavê wî pê re şîret lê girtibûn;

-Her dia bike, bêje, ya Rebî, tu min bi însanên maqûl re heşir bikî... Mirin heye mayîn heye, ez şîreta xwe ya din jî ji niha de li te bikim... Anîna qîzên maqûl zor e, xwedîkirina wan rihet e. Anîna qîzên feqîr rihet e xwedîkirina wan zor e!

Fesîh, ew berê bû bavo, niha her tişt guheri ye, gotibû.

-De mi va go û çû!

Êşa ku dev kiribû canê wî xwe ji wî nedikir, tirs, xwe tirsonek didît! Wî bihîstibû bê Mehdî Zana û hevalên xwe wê wextê çî wêrek bûne...

Rojekê li ber dîwar rûdine û digirî. Diya wî lê dertê, jê dipirse bê çima digirî, bi kelegirî dibêje:

"Ez tirsonek im! Elînewêrekê taxa me ez im! Te îja fehm kir bê ez çima digirîm, dekêfa xwe bike!"

-Na, lawê min, tu ne tirsonek î, ez diya te me, dê ewladê xwe xweş dinasin, tu bîaqil î, aqilê te nahêle tu gavên şaş biavêjî, te bi zarên kesî re şer nekir, tu dûrê xirabiyê disekinî, tu çima newêrek bî! Jinik bi dengê wisa pê de çû hew wê dengê xwe bihîst; 'Ji xwe tirs tamarkî emirkin e!

Fesîh li xwe werqilî, wext gellek dereng bû, çû oda Polîşanê, Polîşan li hemberî fotografê Lêlayê rawestiyabû. Fesîh çû, ew hembêz kir.

Fesîh li sahafekê bû. Ji mishef, 'efemera', fotograf, kovar û pîlaq, teyb û radyonên kevn cî di dikana qasî dusedmetreyî de nemabû. Ji derî de bi qasî gavekê cî hebû. Li ser qentera mezin rojname tije bûn. Fesîh lîsteya sê heb mishefên ku di malpera wê sahafê de dîtibûn da zilam. Zilam jê re got:

"Tu halê me dibinî, heya du hefteyan zor e mishefên te amade bikim."

-Tişt pê nayê. Bi destûra te, ez li van mishef, fotograf û kovaran binihêrim.

-Me qerar daye em kesî nagirin hundur û bi nav mishefan naxin, tu ne xerîb î, kerem ke!

-Sipas dikim, wisa xuya ye ezê nikaribim zêde pêş ve biçim!

-Mixabin!

Mishefeke rûpelên wê hindik bala Fesîh kişand, vekir, mishef bi îmze bû. Weke îthaf wisa hatibû nivîsîn:

"Heqê axaftina 'yildirim':

Pênc qasî axaftina adî ye.

Û ew axaftin beriya axaftinên lezgîn têne temînkirin

Ji Selçuk Tunalı bi tevî gellek tiştan...

19.5.1973"

Kunya mishefê mereq kir. Bi tenê bo dîzayna bergê, "Studyo Cengiz" hatibû nivîsîn, navê weşanxaneyê û sala weşînê nehatibû nivîsîn. Navê mishefê weke, "axaftinên bi boudler re" bi tirkî hatibû nivîsîn. Di têlefona bêrikê de, di googlê de mishefê da ber lêpîrsînê. Di qada sanal de di gellek pirtûkfiroş û sahafan de ew mishef weke mishefa firotinê di dihat xuyakirin. Bi tevî li ser mishefê agahiyên wisa tunebûn jî di malpera sahafekê de hatibû nivîsîn ew mishef ji alî nivîskarê xwe ve hatiye çapkirin, di malpera sahafek din de jî agahiyek wisa hebû: "Çapxana Bozkurt, 1973 Izmir"

Fesîh xwest her tiştî ji bîr ke, bêyî mehneyê şîrove bike her biminmine:

-Heqê axaftina lezgîn

Pênc qasî axaftina adî ye!

Rawestiya û xwe bi xwe got, ew axaftin... ew axaftin, axaftinên wisa ne kes xwe bixwe diaxivin, ne hêjayê nivê axaftinên dîtir in!

Ew mishef terxan kir. Ji ku dizanî ê wê rojê ew ê wisa bişens be. Mishefên peritî an jî nivîs jêçûyî her ew dicoşandin. Çi xêz û nivîsên jêçûyî hebûn texmîn dikirin, li gorî xwe ew hevok û beşê tamam dikirin. Ji bo fotografên qelişî jî wisa bû, ew fotograf dikirîn, dibirin, li dikana xwe aliyên qelişî yê fotografan texmîn dikir, li ser kaxizekê xêz dikir. Karteke fotografê Ornella Mutî lêbû kiribû, ew kart kiribû çend parçe, ciyê kêr yê fotograf xeyal kiribûn, ya rast saz kiribûn!

Mishefeke rengçûyî li erdê dît. Rahêştê. Di nav mishefê de fotografek hebû. Li fotograf nihêrî, rûpelên mishefê qulubandin. Tişt jê neket serê wî.

Li ciyê xwe rawestiya û li fotografên li erdê nihêrî. Fotografên malbatan, fotograf û afîşên hunermend, mûzisyen, artist û aktrîstan, kartên cî û bajaran... Ji fotografan jê du sê heb girt, li nivîsên li paş fotografan nihêrî, ew nivîs û fotograf bi metirsiya ji jiyana taybet ya mirovan, ew avêtin nav fotografan. Xwe bi xwe got, ger taybetiyên fotografan hebûya ê mîratgir an jî xwediyên wan fotografan ew neanîbana, nedana sahaf, gelo mimkun bû ku giş di nav rûpelên mishefan de hatibin ji bîrkirin, belkî, belkî jî eleqeya mîratgiran û wan fotografan nemabû! Ne yek bû, ne deh bû li erdê bi dehan fotografên reş û spî...

Ew bi fikir û bi xeyal bû. Hin fotograf di blogê de bihatana weşandin ê eleqe bidîtana. Di wê kêliyê de xebatkarek li dikanê bi lez radihişt kovar û mishefan, bi heman lezê li pêş û paş wan dinihêrî, bi wî awayî, ên bo wan bi nirx hema terxan dikirin. Çawa dest avêt kovarekê, di bin kovarê de fotografek hate dît. Fesîh matmayî bû. Qey destekî bisirûraz ew fotograf anî bû!

Xwezî got, xwe bi xwe, bi tesadifekê re ev neqewimiya, ew hêza sêwirînê bi min re hebûya, min karibûya sehneyeke wisa biafiranda tişt a niha bi serê mi de hat di wê sehneya hatî sêwirîn de cî bigirta, wê wextê min ê di blogê de metnên sêwirînê jî lêkirana!

Li fotografê dinihêrî. Aşê bayê. Li pêşberî aş kevirekî mezin. Li ser kevir jinek. Li ser wê xirqe, bişkovên jêrîn yên xirqe vekirî ne. Jinikê di fotograf de, du pêşên xirqe bi milên xwe kirine weke bask, qey bedena xwe hiştiye bo bayê, jina devlîken û çavgirtî fîgûrek xweşik ya dansê pêşkêş kiriye!

Got: Îro roj min e, min fotografekî wisa dît ku ê jina min gellek şad be!

Zilam li wî nihêrî.

Fotograf rê zilam da, got, ez dixwazim vî fotografî bikirim lê ji ber jiyana taybet û mafê jinikê bi xem im.

Zilam rahêşt fotograf, lê nihêrî, dît ku ne fotografekî meşhûran ê dîrokî ye, bo xwe nekir xem, bibe, tişt pê nayê got! Tiştên bedew û bo me gellek binirx bo kesên dîtir jirêzê û bêqîmet bû, bi wê dîtîne re xwest bide ber dilê xwe lê dîsa jî hêrs pê re hebû bê çawa li hemberî dîmeneke wisa xweşik ew zilam dikarî normal tevbigeriya! Di dilê xwe de got, çepgîrekî kokonez yê li vî welatî ye, tu aniha pê re rûnê, dikare bi meh û salan şîrovevên sîyasî bike, tu were li vî ecêbê, li hemberî dîmeneke wisa çi dibêje, xort û keç rexne li wan digirin bê hesta bedewbûnê û eşqê bi wan re nîn e, gellek ji wan bihêrs dikevin!

Heqê fotograf pirsî. Perê hûr hebe bes e, got zilam. Fesîh perê hûr derxistin, dan wî. Kêlîkekê ferq kir ku mishef ji bîr kiriye. Gavek paş ve avêt, mishefa terxan kiribû ew jî girt, li hêlekê jî bişirî bê çawa fotograf bûbû sebebe ew wê mishefê ji bîr bike! Heqê wê jî da.

Li ser refekê, mishefa Umberto Eco ya bi navê, "Di Estetîka Heyama Navîn de Huner û Bedewî" dît. Ew mishef li mala wan hebû. Li bûhayê wê nihêrî, erzan bû, bi nîyeta rojekê bo nasek bike xelat ew jî kirî.

Zilam wexta hewl dida di kompîtorê de mishefa Eco ji qeydê de bixe bi dengekî qube diaxivî:

"Nifşê nû tam pînc e! Te dîtîye mishef li vir heye lê xebatkarê mi ew di kompîtorê de qeyd nekiriye. Pey re jî ewê rahêje mishefê û bibe! Belê di wexta wextê de me jî mishef didizîn lê 'dewûdozek' me hebû! Dewûdozeke vî nifşî jî nîn e!

-Tu dîsa jî wisa lê bifikire ku xebatkarê te ji bîr kiriye qeyd bike!

-Nalo. Em çi dibînin çi nabînin, baweriya min ne bi vî welatî maye ne jî bi mirovan! Fersend bi destê min bikeve sibehê ez ê terka vî welatî bikim!

Fesîh texmîn dikir bê sohbet dom bike ê ne kêfa mishefan pê re bimîne ne jî kêfa fotografê! Sebir, got, sebir bike, bêhêvî nemîne!

Li wî cîwarê ku ji alî aborî ve arîşe tunebûn, exlebe burokrat û rewşenbîrên laîk yê xwe weke komarparêz dihesibandin, çepgirên neteweperest û koçberên ji welatên dîtir yê kevn bi cî bûbûn. Demeke dirêj bû partiyek mihefezekar û dîndar li ser hukum bû. Fors û hukmê leşkeran her diçû kêmbû, di qada jiyana sekuler de mirovan xwe di bin zevtê de hîs dikirin. Zilam çend mînak ji encamên wan sebebên ji Fesîh re gotin ku giş jî qewimînên adî yê jê nedihat bawerkirin ku 'kesên demokrat' bikin! Li gorî zilam, ew kesên "laîk" û demokrat, yê li wî bajarî, ji alî teşeyê jiyane ve xwe azad hîs dikirin ji wan hin kes di nav qeyranên ruhî de bûn û ji wan jê jî yê bi nexweşiyên giran re dijiyan, hebûn. Fesîh texmîn nedikir bê mirov ketibin rewşeke wisa bi tevîhev û bêhêvî. Bifikire got, zilam, hevaleyê min yê bi salan e, ez wî dinasim, çi kesekî fedekar bû, îro ji pûştîyê ketibe tu tiştî nake, bûyerên edlî yê adî ên wisa diqewimin ku meriv diheyire...

Fesîh got:

-Beşeke ji rêveberiya vî welatî, xwe xwediyê vî welatî didîtin, kesên ku li ber çavên wan paşverû, cahil û bi talûke bûn ew kes hatin, desthilatîyê ji wan girtin û îro jî ew li hêlekê heyfa xwe digirin li alî din jî cî li wanên din teng dikin, bi 'kêf' û hesta serkeftinê, heman serxweşiyê rêveberiya aniha dijî, zor e... Mi bi wî çavî li meselê nenihêrbû, bi gotineke din, tiştên tu behs dikî birîn in lê bi min ne birînên kûr in çimkî derdê mi ê zortir hene ku herdu alî jî naxwazin ji derdê min fehm bikin!

Zilam keniya!

-Pir zor e. Bi wî awayî ê 'pirsgirêka kurd' jî hel nekin. Nemîne li benda gavên wisa!

-Ê baş e, nexwe ev çi ye hewqas mishefan tînin cem te, cî nemaye tu mishefan deynî, bi tevî ku tu dibêjî, di qada înternetê de ez gellek mishefan difiroşim?

-Derdora ku mishef dixwendin, li vî bajarî, qismek jê ji rewşa aborî nikarin bixwînin, derdoreke dîtir jî ditirse. Kî dikare bawer bike, heya demeke kurt jî, mishef û weşanên cem'etekê bi fors, weke nîşana hêz û rûmetê dihatin xwendin û firotin, piştî nakokî, aloziyan yê di navbera wan û deshilatîyê de, weşanên wê cim'etê dikare weke delîl bibin sebeb meriv bi salan di girtîgehê de bimîne...

Fesîh keniya. Got:

-Di nav van mishefan de çi mishef e ku bo wan kesên tu dibêjî bi tirs in, bibe talûke!

-Wisa nefikire, mirov ketine halek şîzofren, di nav qeyranên ruhê de ne!

Fesîh li gellek ciyan, ji devê kesên xwe laîk, çepgir, neteweperest xemên wisa bihîstibûn. Bi qasî wan ne bi wê tatêlê bû, gotina ku her dikir dubare kir:

-Demokrasî. Kanûneke hemdem... Eleqa mi û sîyasetê hewqas ne baş e lê li 'jor' binihêre, 'ji ber xem û metirsiya dahatuya dewletê' ji vê kanûna bi arîşe kêfxweş in! Mirovên tu behsa qeyranên wan dikî derdê wan ne demokrasî ye ew bo hukum û desthilatiya xwe bi xem in!

Zilam bi dengê şikestî got:

-Ew jî rast e.

Fesîh, ji bo di zûtirîn demê de ji wir biçe, diqilqilî, ew ê biçûya li kuncikekê çay vebixwara û hin nîşeyan bo bloga xwe lêkira. Got:

-Karê te karek hêja ye, çi dibe bila be, tu guh li wan xireciran neke, çare û derman, belkî jî dîsa ev dever e, mishef in, bêhna xwe fireh bike, ez ê biçim, li xwe miqate be, sipas bo alîkariyê.

Bi wan gotinan, tu fersend bo zilam nehiştibû ku zilam biaxive. Derket. Zilam deng lê kir:

-Neçe, min mishefekê bo xanima xwe terxan kiribû, do weke hewla dawî ez çûm, min hewl da ez pê re biaxivim da ku em dev ji hev bernedin, zaroka me guneh e, mixabin ew li ser a xwe ye, tu vê mishefê bibe ji bo xanima xwe.

Fesîh, xemgîn im bo te, sipas dikim, got, rahêşt mishefê. Mishefa Sophîa Loren a bi navê, "Mîtbaxa Eşqê" bû. Bi dubareyî sipasiya zilam kir, meşiya.

Di rê de li xwe mukir hat bê Polîşan di sohbetên derheq mêrê xwe yê pêşî de çi mafdar bûye. Ji hin qewimîn û gotinên ku Polîşanê kiribûn bawer nekiribû. Polîşana ku bi salan li wî cîwarî jiyabû Fesîh biribû wê sahafê, ew bi hev dabûn nasîn. Di nav sohbetê xwe de, zilam gotineke wisa kiribû; îcab nake ez her tiştî ji te re bêjim, niha 'Polîşan Yenge' gellek tişt ji te re gotine! Fesîh serê xwe hejand. Di sikakê de fotograf ji nav rûpelên mishefê derxist. Dewsa jinikê de Polîşan bi wî halî xeyal kir. Dilê wî germ bû.

Di wê kêliyê de çiqas hewesa xwe bi nivîskariya bisêwirîn anî, bo ew kes û ew fotograf neyê jibîrkin wîyê berhemekê lêkira; keseke ku meriv hîç nas nake, kêlîkekê dibe fîgûra dîmeneke xweşik ya hezkirin, azadî û serbestiyê, rojek tê li

sahafekê, ew fotograf bandor li wî dike, heyfa xwe pê tîne ku ne ew kes e ku karibe bibe sebeb ew fotograf neyê jibîrkin!

Tiştê hebû dikarî bikira, li ser kompîtorê ê rengê fotograf bi awayeke wisa biguheranda da ku ew jinik nehatiba nasîn û mafên wê nehatiba bînpêkirin, pey re jî di bloga xwe de biweşanda! Bi wî awayî ê fotograf bibûya weke sêwirîneke hunerî ya ji nû ve şikilgirtî, çimkî, digote xwe ew ê fotograf bibe fotografekî dîtir! Hinek kêf hatê. Ka raweste, gote xwe, Polîşan, ew ê çî bêje!

Wisa tevdigeriya ku ya ku bi serê wî de hatibû wekî mûcîze didît. Bo wî, bo bloga wî belkî bo Polîşan. Dengê ji dilê wî de hat; hêdî, xwe zevt ke, nehêle ew fotograf wekî dengê armonîkayê bikeve jiyana te, bi xwe re durist be, ew jinik dişibe dildara te, hay ji xwe hebe!

Ji çavşilîyê nikarî nivîsa li paş fotograf bixwîne. Hêsir paqij kirin. Çû, li sikakeke teng rûnişt. Çay xwest. Birsena ku li paşiya fotografê nivîsibû, bi hêviya neyê jibîrkin, 18 Avrêl 1954, nivîsî bû, ew difikirand, dibû sebebê êş û bêrîkirinekê, li alî din jî hêvî dida wî ku ê ji bo Polîşan bibûya kelûpeleke xweşik.

Fesîh difikirî. Bi îhtimaleke mezin, wexta Birsênê bo fotograf cî kifş kiribû, ew poz dabû xwe lê nefikirî bû ku ew, bi saya wî fotografê, xwe nade jibîrkinê. Kesê ku Birsênê ew fotograf îthafê wî kiribû kî bû? Gelo wî Birsênê ji bîr kiribû, kî ji wan pêşî miribû, ji wan kî sax mabû, kî miribû? Pirs û detayên wisa her dihatin ber hişê wî xwe ji wan pirsan dikir, tiştê diviyabû heman bikira ew bû piştî sohbeta bi Polîşan re a di derheq Birsênê de ê şikil bida fotograf û di bloga xwe de biweşanda! Nejbîrkin ne meşhûrbûn bû li gorî Fesîh, ev e, got, aniha ez weke kesekî gellek nêzî wê, pê re mijûl im, hewl didim bi sekna wê re ruhê wê, dilê wê texmîn bikim!

Li kêlek Fesîh sê kesên rûtiştîr rûniştî bûn. Kêzêde gotinên wan dişibîyan gotinên zîlamê sahafî dikir. Heyecana fotograf li wî sar bû. Wîyê zû çaya xwe vexwara û biçûya.

Heya wê rojê, romanên takekesên bi trawma, yên di warên şer de xwendibûn, bi xwendina mishefên derheq dîroka kurdan û dîroka li wî welatî jî hîs dikir her dilê wî kalûpîrtir dibe! Mishef ne trawamyên nivîskaran bûn li gorî wî, trawmayên xwendevanan bûn!

Hin berhemên totalîter, yên îdeolojîk bûbûn sebeb ew derî li gellek tiştan bigire. Çi zor e, digote xwe, wexta meriv terka hişekî û xwendinekê bike, biguhere! Sohbeta

zilam, gotinên kesên li kêleka xwe weke defika rojê hesiband, weke bêyomî û şeytanî dît ku nedihîşt ew li fotograf û li wê mishefê tîr be.

Du zarokên Sûrî ji keştiyê peya bûbûn, hatibûn wê sikakê, di destê yekî de armonîka, Fesîh çawa çav bi armonîkayê ket, bilez destika kaxiz xist tebaqê da ku avê bikişîne, pênc paqnotên kaxiz bo heqê çay xist tebaqê, bêyî bimîne li benda perê ser, îskan danî ser û bi lez çû, şansê wî hebû ku garsonê ku îskanên vala berhev dikirin pekandibû ser zarokan da ku ew bi lêdana armonîkayê ji mişteriyên pere nexwazin, wan aciz mekin û zû ji wir bi dûr bikevin!

Ne çîrokên cuda bûn wê rojê bi serê wî de dihatin, çîrokên rojeke bi seyr bûn bi ser hev de dihatin. Her tesadif weke çîrokeke mabe li benda wê rojê dihat ew didît; keçikeke temenê wê nêzî sîyî xuya dikir, li pêş Fesîh, dimeşiya. Keçika fîstanek bi zemîna gewr, li ser zemînê nexşên golgolînî yê çeqel hebûn, li xwe kiribû, çanteyek spî li nav milê wê bû, destekî xwe dabû ser şebqeyê xwe yê fotr, mîna xanimeke nazdar ya li ser sehneyên şanoyê dimeşiya.

Nêzikahî li keçikê kir, ji bo bi xelet neyê fehmkirin gavên xwe bi leztir kirin, ji xanimê çend gav bi dûr ket, mîna kesek li dû wî be û ew wî kesî mereq bike, li paş xwe zivîrî, keçikê li ber çavên xwe xist, meşiya; rengê esmer, diranên spî, lêvên tije, serûçavên lihevhatî bala wî kişand, ew bejnûbal, serûçav, bedena narîn bi wî gellek nas dihatin, Polîşan, wexta keçik li pêş wî meşiya bû zenkiribû ku kesa li pêş wî dimeşe Polîşan e.

Fîstanê tîrevîre yê dirêj û bi bayê re diket gellek şiklan li ser bejna Polîşanê jî wisa xweşik xuya dikir. Di rojek wek wê rojê ya gellek germ de, li bajarokekî li keviyekê Polîşan bi heman şiklî fîstan li xwe kiribû, (rengê fîstanê Polîşan mor bû), bi du tilîkan bi şebqeyê fotr girtibû, berçavk li ber çavan, çûbû li ber dareke qajê ya temenpiçûk sekinîbû, Fesîh fotografê wê kişandibû.

Li cem Polîşanê bûya ê ew hembêz bikira... Di dilê xwe de got, zû biçim malê, mankena xwe ramûsim... Gavên bi lez. Hê şîret li xwe digirtin, ehmeqî meke, xortanî çû, nehêle bila ev heyamê navsale ji emrê te biçe, bi pehînan li dîwarên jiyane de!

Ne ew roj bû guh li tirsaxwe bikira, gavek du gavên din, xwe ji wî halî dikir, pirsaxwe ku di kêliyên dilxweşiyayê wî de, di derheq Polîşan de dihat û pêşkarê wî dibû, wê pirsê ew aciz dikir, pirseke wisa hatibû hişê wî; a ku ew diêşand çîroka armonîkaya hêşîn bû yan tirsaxwe derheq Polîşan de bû? Polîşan têra xwe meşhûr bûya wîyê çî bertekî rê bida? Ji Polîşanê re negota jî, bo hin nêzikahiyan heq dida mêrê Polîşanê yê pêşî!

Dida ber dilê xwe; 'temam Polîşan hunermend e, hurmet li hunera wê digirim lê ew çî heyecan û armancên hewqas mezin û cihê ne, ew çî wêrekî û serbestî ye' Polîşan dike xwe bi xwe got Got, dewam kir, Polîşan, tu aniha di nava 'dilûhişê' min de bûya û te ev gotin bibihîstana... Beden lê sar bûbû, hewqas ku di wê germê de bedena wî xwêdan nedida! Na, gote xwe, heqê Polîşanê li ser mi pir e, ew bû sebeb ez li gellek

detayan werqilim, çanda malbateke arîstokrat a kurd bi wê re hebû, ew bû sebab ez li hinhêlên din yên jiyane vebikim!

Bi wî awayî nedibû, êş, xem, metirsî, şerûpevçûna di hundurê xwe de safî nekira ew ê biketa gerînekên mezin, bi fikir û wesweseyên wisa re hewl dida bigihije qerarekê, ez durûtî dikim, gote xwe, Polîşan bi çi çavî li min dinihêre, ez di nav çi aloziyan de me...

Gihaştibû nêzî parkekê, li ber darekê rûnişt, hebê stresê avêt devê xwe, avê vexwar. Hêvîyekê dida xwe; hêvîdar im mêrê wê yê pêşî têra xwe, li vî bajarî, ew li ber çavên organîzator û kesên eleqeder, ji alî dansê ve, bêîtibar kiribe!

'Tuyê niha biçî, bi ser van gotinan de, Polîşanê hembêz bikî! Durû! Tirsonek!' gote xwe, zevta li ser dil û mejiyê xwe sist kir; 'çi tê serê însanan çi nayê, dilê merivan wisa ye, ez çi bikim, jê hez dikim, ditirsim, ez ne tirsonek im, ditirsim!' lê zêde kir, ji ber hevoka dawî ken pê ket!

Xweziya xwe bi jiyana di fîlman de dianî; çi xweş bû, bêhtir, di fîlmên welatên rojavayî de karakter li hemberî hev durist tevdigeriyan, ji hev hez dikirin, arîşe derketa an jî neketa serê wan, hurmet li hev digirtin, ji hev xatir dixwestin... Yê me, got xwe bi xwe, jin tapûya bavê me ya namûsê ye, em kî bin, bibin çi ferq nake, ma tenê em wisa ne, tu nabînî, mêrê wê yê pêşî, yê ji malbateke paşayên leşkerî, yê xwe hewqas laîk û komarparêz hesibandi ye çi çavreşî kirine, hewl daye Polîşanê têxe bin zevta xwe! Wexta jin jina me be, her tişt diguhere! Gotinên bi wî awayî yê ku hewla wî ew bû ji her tiştî haydar e, bêhtir ew diêşandin, 'min mishef nexwenda, dest bi terzîtiyê nekira, Polîşan ji ku bihata ez bidîtama' fikirî!

Walîzê wî li piştê bû. Destekî wî di bêrika şapik de ê din di bêrika mont de bû. Destê di bêrika mont de lê nedisekinî.

Porê dirêj. Serûçavên lihevhatî.. Lê hay bû ku ew halê wî bala mirovan dikişîne. Carna jî walîzên bi kaşkaşî dikişand. Wê rojê ew çantê mezin yê li piştê wî bêhtir bi wî xweşik dihat. Wexta ber bi apartmanê ve dimeşîya Polîşan li ber pencerê bû. Bejnûbala Fesîh, halê meşa wî ya bi kêf dibû sebeb Polîşan hewl bide xweşiktir li armonîkayê bide!

Polîşan, bêyî haya Fesîh jê hebe, hewl dida hîn bibe li armonîkayê de, sê heb armonîka kirîbûn. Di qada înternetê de di nav lêgerînan de bû, li vîdyoyan temaşê dikir, pê re jî hewl dida li armonîkayê bide. Li benda wê rojê bû surprîzekê bo Fesîh bike.

Fesîh li ber derî fotograf û mishef ji çantê mezin yê li piştê xwe derxistin, fotograf di destekî wî de, mishef di destê din de bû, xwe ji halê xwe yê bimetirsî kir, çû hundur, navê dîroka îro ji min re bêje Polîşan, îro çi rojê xweş û bi surprîz e, got. Polîşan bi hinarikên sorik li wî, li destên wî nihêrî. Polîşanê hembêz kir, ew ramûsa, bi destê wê girt, li ser kanepê, bi heyecan hewl da wî fotografê li ser kevir şîrove bike!

Polîşan ew fotograf maçî kir û got:

-Jinên wisa, çiqas ji jinên wisa hez dikim!

Fesîh bi bêdengî lê nihêrî. Polîşan pê de çû:

-Ka li Sophîayê binihêre, hin jin hene fotografên wan bi tenê jiyaneke pêşkêşî merivan dikan, hevî didin merivan, Sophîa û "mitbaxa eşqê", sipasiya te dikim Fesîh, sipasî bo sahaf... Te ez kêfxweş kirim. Jinika li ser kevir poz daye xwe, heke karibim kêliya wê wextê ya ruhê wê zevt bikim ê baş be!

Aniha... Fesîh gotin ji devê wê girt; aniha wexta pirsekê ye, 'Fesîh tu ji min hez dikî?'

-Bi qasî ruhê xwe Polîşan!

-Baş e, em biçin mitbaxê!

Polîşan ji ber dubarekirina wê dîyalogê a bi awayek bi texlîd keniya. Li dû kenê gote wî:

-Berxê, binihêre kesê weke Sophia Lorenê navê mishefa xwe, "Mitbexa Eşqê" lêkiriye!

-Ciyê eşqê lê hebe, ma ez dînim jê birevim!

Li mitbaxê, li ser piyan Polîşan rûpelên mishefa Sophia Lorenê qulubandin. Mishef danî ser masê, miqarneya bi teqaş amade kirin. Li hêlekê jî li gotinên xwe mukir dihat; gelo ciyê eşq lê hebûya ew ji nedirevî? Bi awayek jixwebawer berisv neda pirsaxwe!

Li pey xwarinê bi mishefan re mijûl bûn, li fotografê nihêrîn. Fesîh serê xwe danî ser sîngê Polîşanê. Dikir ku nakokî, xem, metirsî û tirsaxwe yek bi yek ji Polîşanê re bêje, gotin heya ser zimanê wî dihat û li wir diman. Tiştaxwe ez dijîm ne îş e, ez ê bêjim jî Polîşan nikare bo ciyê qelaştî pîneyek normal bibîne, fikirî.

Got, îro, beriya werim malê dîsa mîda min êşiya!

-Tu çima naçî doktor?

-Ditirsim.

-Niha yê ditirse tu bi tenê yî, biçe doktor, çî ye bila derkeve meydanê. Ger êş be bila êşame herduya be. Tu bi fîşalî tevdigerî.

-Na. Hevalê min yê bi nexweşiya giran ket, beriya nexweşiya xwe wî çî digot, niha ew bi serê min de tîn!

-Tiştên xirab neyne hişê xwe, wext diçe meriv her disêwire, nexweşî tunebe jî, doktor dibêjin, ew hal dibe sebebê arîşeyên dîtir. Sibe, biçe doktor, dixwazî bi te re werim?

-Ne muhîm e, ez ê biçim.

-Te çî gotineke xweş kir; wisa, tiştan li xwe giran meke!

"Tiştan li xwe giran meke." Ew gotina Polîşanê di hişê Fesîh de çû û hat. Ji eleqeya Polîşanê bû an sebebên dîtir hebûn, nizanibû, got:

- Ez ditirsim tu dev ji min bere dî!

Polîşan bi merhemet, bi tewrên wîjdanî li wî nihêrî. Fesîh heyirîbû bê çima Polîşan mat nemabû, bertekiyên sert rê wî nedabûn.

Polîşan xwe serkeftî hîs kir ku gavek wisa ji alî Fesîh ve hatiye avêtin; Fesîh bêyî veşêre, bêyî bi halê nostaljik, melankolîk û bi tewr û axaftinên tevlîhev xwe bid dest, raste rast a di dil û hişê xwe de jê re gotibû. Polîşan nedixwest ew tewr hema were ji bîr kirin:

-Tu bi wan gotinên xwe li ber çavên min hêjatir î, te rasterast a di dil û hişê xwe de got, ew jî tê wê mehnê tu ji xwe jî hez dikî, wexta tu ji xwe hez bikî tu qedir li min jî digirî çimkî ez jî dildara te me, mesele hewqas basît e lê di hin meseleyan de, te nedixwest tu min biêşînî te her tişt vedişart, bi wî awayî tu bêhtir diêşiyayî, te ez jî diêşandim, li benda kêliyek wisa bûm. Sohbetên rojane tişteki ne wî bidin dera ha lê wexta hezkiriyên merivan ji merivan re dibêjin, dixwazim bi te re bixivim, a, ew tişteki din e û gellek xweş e, navên din bo wan sohbetan tê bîra merivan; sohbetaxwe nasûdostan, sohbetaxwe muhiban, sohbetaxwe hezkiriyên, sohbetaxwe dildaran...

-Wexta ji bo te li mishefan digirim, hewl didim tu fîgurên xweştir biafirînî, jidil im, pey re îhtimala halê te yê gellek meşhûr tê ber çavên mi, tirsaxwe dipeke ser min!

Polîşan bêdeng ma. Rabû ser xwe. Dengê mûzîkeke klasîk ji pîlaqê bilind bû.

Fotografê jinikê li ser sehpe bi cî kir, li paş fotograf vazoyek piçûk ya dişibiya bistiyê qelûnekê hebû. Vîskî anî.

Vîskî vedixwarin. Polîşan çû oda xebatê, fotografekî Leîla Bedirxanê anî. Bi heyecan fikra di nav rojê de hatibû hişê wê jê re got:

-Ka li kostûmê wê binihêre, çawa li ser erdê bi awayek azad şikil daye xwe, îro hat hişê min, ez dikarim kostumeke bi wî awayî yê rengspî amade bikim... Min îro neynik da hemberî xwe, bi rengê spî û bi wê figûrê xwe xeyal kir. Zanî bi saetan bi pey ketim bi nihêrînên xwe figûrekê bisirûraz bikim bi serneketim. Tu Leîlayê dibînî, bi nihêrînên xwe dîmeneke wisa pêşkêş dike qey balindeyeke wisa ye ku bi qasî li hewayê li erdê jî hewqas bi heybet e.

-Neheqiyê li xwe meke.

-Ne mesela neheqiyê ye... Baş e, min dixwest bêjim ji jiyana Êzidiyan feyz bigirim û stîlên dansê bi dest bixim. Min xwendibû, ji stîlên dansên Misrê û dansên Asûrî feyz girtiye. Rengê spî û bi tevgerên dansê re kostûmê li ser erdê, mereq dikim, wisa be ku bi dansê re erd nikaribe rengê spîbi leke bike!

-Li xwe mukir têm, gotina te ya dawî bi min giran hat!

-Tiştêk basît e, bi dansa xwe ez ê nehêlim spî qilêr be! Tu mehne lê digirî...

-Tu perîya dansê yî, na, gulperiya dansê yî...

-Spas dikim, got û ji odê derket, piştî wextekê hat, rûja li lêvên wê bala Fesîh kişand, Fesîh hestiyar bû; heke Polîşan ji rengê rûja li lêvên Leîlayê rûj li lêvên xwe xistibe, mûzîkeke klasîk were bihîstin û vîskî hebe ji bo Fesîh mehna wê ew bû ku Polîşan bi dil û canê xwe dildara wî bû...

Hewl dida bide xuyakirin bê bi hewla canê xwe ji wê hez dike:

-Bila şevên xewan li min heram bin Polîşan, ez ê kostumeke wisa bo te bibirim xelk tilî têxin guhê xwe!

Polîşan çû, li pêşiya wî rûnişt, destê xwe xist nav porê wî. Fesîh bi lêvên wê ket. Derengî şevê bû. Polîşan jê re got, ji ber çîroka armonîkaya hêşîn, heya niha min nexwest ez welatê te bînim bîra te, îşev ji min re behsa wan deran bike! Ji pêşiyên me, got, çû defterekê anî, pê de çû, weke mîrate û şîreteke malbatî ev defter maye li cem min, ji heman defterê li cem gellek kesên malbatê heye. Di defterê de biwêjên bi kurdî hene ku ew bi tirkî hatine nivîsîn. Pêşiyekî malbatê şîret li malbata me girtiye û gotiye, wan biwêjan wenda nekin, ew di her wextê de, weke tecrubeyên kûr û dûr yên jiyana ew ê bo we bibin alîkar.

Aniha hew ew deftera biwêjan e maye li cem min, herçî mishefên derheq malbata min de û derheqê welatê malbata min de ne, wexta ez wan mishefan dixwînim weke welatekî dûr û dûr e, welatekî çîrçîrokî...

Fesîh rabû, ji nav mishefan defterekê anî. Got:

- Ez ê nikaribim weke mishefa Memê Alan bi awayek xweşraz ji te re behs bikim. Di defterê de hin nîşeyên min yên ecêb hene.

Di xwendinê de gellek giran bû; li parçên qumaş çiqas bi bal û bi mitale bû, bêhay, li her hevokê zêde radiwestiya, li ku bû hevok li ber çavên xwe parçe dikirin:

"Welatekî bi robar, bi çem û kanî ye. Zimanê wan kêr nivîs dîtiye. Welatekî wisa ye zimanê wan mîna wan parçe bûye, li ku ye, her gundekî mîna welatekî piçûk yê di

çîrçîrok de ye her çî bajarên wî welatî ne bi zimanên biyanî jiyana xwe derbas dikin. Ji bo bireserekê tu dikarî bi dehan navan di wî zimanî de bibînî. Ew halê ziman dibe sebab dengbêjên wan, dildarên wan bo kilaman gotinên xweş saz bikin."

Fesîh kaxizê qat kir, danî kêlekaxwe, pê de çû:

- Zimanekî bi înyad. Dibêjin ziman û destan mîna av û axê ne. Di zarokaniya min de, dapîrekê berê xwe dabû lûtkeya çiyê, pencikên tavê bi ser wechê wê de dihatin, bi dengê kubar ji min re got; bexê min, gotinên mê û yên xweş bêje ji yara xwe re, emrê eşqê ziman e!

Sofîyek hebû li taxa me. Bostanê wî hebû. Cîranekî me jê re got, tu wisa ji bostan bixwe, Xwedê kerîm e, tuyê zor biçî cinetê! Sofî gotê:

-Ez ê bixwim, cinet min qebûl neke cehneme amade ye, ê cehneme qûna min maçî ke û min qebûl ke!

Ken li Polîşanê sar bûbû, got:

-Kalikê min carna vedigot, wexta wî vedigot her tişt bi mi dibû mîna çîrçîrok!

Fesîh bo vegotinê zorê neda xwe, vegotina wî di bin bandora rabirduya wî de bû:

-Avên sar hene li wir, mîna kêrê ne... Hestiyarî, hêrs, kîn ûnefreta di kêliyan de dibin mîna kêr. Kêm kesan dikarî hêrsa xwe kontrol bikira. Kesên çavsor hebûn, mirovan hefza xwe ji wan fikir, hîmal bû ji bo hincetekê mêr bikuştana, an bibûna fîrarê çol û çiyar an jî biketana hefs û zîndan. Zagonên hest li wir tunebû, ew bi aîdî surîştê bû, mîna bayê bû, kî dikarî pêşî li bayê bigirta, ew jî wisa bûn, mîna bayê, hêrsa wan dibû mîna agir, agirê sor, wê kêliyê hin jê diketin halê dirindeyek, hêriş dikirin, xwîn diherikî, mêr dihat kuştin, koçberî, bertîl, berdêla pevçûnê... Heke perê wan hebûya, mixabin, ê dengbêjan ew texistina kilaman... Çîrçîrok û çîrokên pêşiyên me zêde ne...

-Kalikê min ticar behsa tiştên wisa nedikir. Wî behsa kevokan fikir, behsa çiyayên bêserî fikir, çiqas diaxivî bi wî re bêhna gul û çîçegan dihat min. Destanên wî vedigotin ez dibirim xewên xweş.

Fesîh bédeng ma. Li wê nihêrî. Rengê Fesîh guherîbû. Polîşan gotê:

-Li xwe megire. Belkî ez zarok bûm lewma kêfa min ji wî awayî re dihat, belkî dengê kalikê minbû lewma bandor li min fikir, tu tiştên xweşik vedibêjî. Ev e, her kes 'li pey dengê' ye! Kalikê te, derheqê kalikê xwe de tiştinan vebêje.

-Baş e... Kalikê min beyt digotin. Çi fersend bidîta bi me re govend digerland!

Polîşan ji nav mishefan defter anî da Fesîh. Deftera ji kaxizên kayê ya bi rengê zer ê qimitî bi destnîveseke gellek xweş balê dikişand. Fesîh ji defterê hin biwêj xwendin. Bi qasî ku Polîşan li bendê bû biheyecan nebû, got:

-Tu vana dibînî, ew ji bo axaftina me mîna xwê ne, gotinên wisa tijî ne, bikeve înternetê, qîyamet!

-Yan kalikê min mirovekî ecêb bûye an jî gellek tişt guherî ne!

-Mîn fehm nekir?

-Wexta qala wan biwêjan fikir weke ji mishefeke pîroz biaxive, diaxivî! Li te dinihêrim tu weke tişteke ji rêzê dibînî! Belê, ez ketim înternetê, hin jê li tirkî hatine

wergerandin, yên pir xirab hatine wergerandin jî hene, bi tevî ez bi kurdî nizamim jî di tirkîya wan de valahiyek, mehneyek şaş an jî kêm xuya dike!

-Heke ji bo te muhîm be ez dikarim berhev bikim!

-Çima ji bo min? Heke ji bo te bi qasî kalikê min qedrê wan gotinan li cem te hebe, tu bi kêf û qerara xwe yî!

-Ez ê lê bifikirim...

-Ne tişteke basî e!

-Ez ê derheq berhevkerinê de lêkolînan bikim, hê dest pê bikim!

-Tu bi qerar î!

-Te digot, guh li pêşniyaran bike, bila bala te li tesadifan be!

-Tesadif! Belê, bila bala te li tesadifan be! Were, ji niha de ez ji bo şensê te vekirîbe te ramûsim! Li pey ramûsanê destegerdenî hev bûn.

Polîşan ji serşokê hatibû, Fesîh çû serşokê. Polîşan kinc li xwe kirin, pencere vekir. Li ser masê, di tebaqê de kulîçe hebûn. Rahêşt kulîçeyekê, ew bir devê xwe, rûpeleke defterê vekir. Ji ber ku li ser defterê têra xwe neaxivî bû, çûbû nav nivînan xwe mehçûb hîs kir, kêlîkekê çawa bîranînên kalikê xwe ji bîr kiribûn tenedigihîşt!

Fesîh ji odeyekê de derket. Wî jî kulîçe xwarin.

Polîşan qehwe amade dikir, pê de diçû:

-Kalikê min digot biwêj fotografên hunermendên zimanekî ne!

-Ji wênesazekî gotinên wisa tê hêvîkirin. Xwezî deftera wî ya wenda bihata dîtin!

-Deftera wenda?

-Belê, deftereke wî ya ku wêneyên wî saz kiribûn tê de bûn wenda ye!

-Mesela wendabûnê xweş dikeve jiyana me.

-Belê.

-Te tu lêkolîn kirin an na?

-Bavê min bi salan bi pey ket. Kalikê min di xortaniya xwe de bûye dildarê ebeyekê. Bi wê hesretê bûye daku bo eşqa xwe helbestan binivîse, biserneketiye, pey re xwe li wênesaziyê girtiye. Tê hêvîkiir ku wêneyên eşqê di wê defterê de hene. Yan disêwirim an jî bi rastî min ew defter dîtiye, mîna xewên şevan tê ber çavên min, li rûpela pêşî a defterê wêneyê çavkî hebûn, çavekî weke morîka nezerê!

- Her tişt li ber çavên me dibe mîna sûretekê!

-Di dansê de ew derfet nîn e meriv sûretan bibîne; wexta dans dikim qey di bin lingên min de agir heye, xwe di nav rengê agir de dibînim, hewl didim ruh bibe ba û ji wî agirî prîsk bifurin... Di navberê de jî weke Leîlayê rawestim, di nav agir de bibim şêr! Dixwazim wan rojan bibînim.

-Tuyê bibînî, got, Fesîh, biwêjên derheq agir de, ên bala Polîşanê bikişînin rêz kir; "Mîna agirê şevê ye", "Avê li agir meke", "Agirê sor e", "Agirê cehnimê ye", "Agirê kulê ye", "Agirê gurr" "Mîna çirûskên agir her yek bi çiyekî ve dipeke" "Tu çi agir î"...Pey re, bi zor û zehmetî li tirkî wergerandin ...

-Sipas bo moralê... Bi bişirîn pê de çû, te jî wek hin kesên di qada înternetê de biwêj li tirkî wergerandin, baş e min fehm kir... Tu, tu dixwazî kîjan royê bibînî?

- Bi qasî ku min dixwest ji min terziyekî baş derket, ma dewamam wê!

-Dewama terzîtiyê çi ye?

-Li bajarê xwe bibûma şaredar!

-Tu û polîtîka? Surprîz divê wisa bin!

-Bavê min bibû sebab ez bibim heyranê Mehdî Zana!

Li ser pirsên Polîşanê, Fesîh behsa salên navbera heftê û heştê de kiribû ku ew bêhtir şahidê salên nêzî heştê bû.

-Em navê mala xwe lêkin, "Mala Heyranan"!

Bi tîqetîq bûn. Rengekî cidî hatibû rûyê Polîşanê, got:

-Biçe li welatê xwe bijî!

-Tu çi dibêjî Polîşan?

-Ez dibêjim ji bo tu bibî şaredar, biçe li welatê xwe bijî!

-Îro em dişibin kevirê di kendal de gilêr be, her carî li ciyekî dikevin, ev ji ku derket?

-A di dilê te de, ez jê fehm dikim, jidil û can dibêjim, hêja ye ku tu ji bo a di dilê xwe de biçî welatê xwe!

-Lê tu?

-Ez û tu bêzarok in, roja pêş me li hev kiribû ku ger surprîz biqewimin em ê bi her hawî jê re amade bin!

-Polîşan!

-Tu ne mecbûrî li vir bisekinî.

Fesîh ne kêfxweş bû ku Polîşan ew mijar kifş kiribû. Dengê wî ecêb bû. Hinek rawestiya, nedixwest dengê wî di navbera wan de bibe sebabê xemginiyê, henaseyeke kûr kişand, pirsî:

-Tu?

-Ji bo min wext hê zû ye, nizanim... Canê, ez û tu ne dê û ewlad in, belê em jin û mêr in lê xeta min a sor qeyd û bend in, tu xweş pê dizanî!

-Dev ji vê sohbetê bike. Ya çêtir ew e ez berhevkarî bikim. Demekê bo berhevkarîyê biçim, li vegeê ez ê çavdêrî û dîtînen xwe ji te re bêjim.

-Tu bi kêfa xwe yî. Tu hê jî ji dil ber bi mejî ve dimeşî! Hew bîrxistinek e! Mereq dikim, ger rojek surprîzek biqewime tuyê çiqas efûkar bî!

Fesîh bêdeng ma çimkî bersiva wê pirsê wê kêliyê li cem wî tunebû!

“Kürt böreği” li ser camê, li ser kaxizeke koşeyek wê qelişî hatibû nivîsîn. Peyva pêşî weke bi qestî xirab hatibe nivîsîn, pê bala neteweperwerên wî bajarî nekişîne û ew ji dikanê sil nebin. Fesîh merhebatî da hosta. Di nava du deqeyan de bo taştiya wî jê re pakêtekê amade kirin. Fesîh "kêlîkeke ji jiyana xwe" ya ji her sibeha dihat dikanê dijiya;

pelûpûş, kerengperek, şapîkek ji pîneyan yê zarokan-darîkek, naylon, saeteke xirabûyî... li qeraxê çemekê bûne... Tîrêj li ser saetê bi teysbûne. Zarokekî, ji hewla canê xwe ber bi wê teysê ve beziya ye! Rahêştîye saetê û qîriya ye;

Saeta min heye!

Fesîh her sibehê wexta derê dikana xwe vedikir, ji dil dihat wekî wî zarokî bike qêrîn;

"Dikana min heye!"

Dikan li qatê diduyan bû. Avahiyeke kevn ku bi awayê mîmariya Grekiyan hatibû avakirin. Dikan 'yekçavî' bû. Sala hatibû bi çi halî ji destê yekî girtibû û bi kirê tê de bû hê bi heman halî bû çimkî terziyê berê bi wî qewl û sozê dest nedabû alav û fotografên di dikanê de. Ji Fesîh re gotibû, ger tu rojekê dewr bikî an jî dest ji kar bikî xeberê bide min, ez ê werim alav û fotografên xwe bibim, heke ez bersiv nedim têlefona te, rojekê sebir bike pey re gişan bibe "Bit Pazarî"yê, tiştên biçin wir wenda nabin, gellek kesên eleqedar diçinwan bazaran û xwedî li alavên antîke derdikevin!

Sê makîneyên kevn yên malên Alman ên xirabûyî li ser masekê bûn. Li dîwêr posterên tîmên fûtbolê ên reşûspî. Kartpostal û afîşên coxrafî. Fotografê zarokekî bi çarpîkan ketî û li kêleka wî fotografê figûreke xêzefîlmekî zarokan. Li ser du teregan

ansîklopedî. Li terega li bin ansîklopediyan qutîkê dermanan... Çend tizbî...
Moriyekî şîn ya mezin a bi qabloyê alaktrîkê ve hatî daliqandin.

Fesîh sê heb armonîka danîbûn ser makîneya dirûtinê ya kevn, ji kelûpelên terzitiyê
ketibe wekî din tişt li dikanê zêde nekiribû!

Piştî taştê xwar, rahêşt armonîkayekê. Di destê xwe de birûanî. Dengê bavê wî di
guhê wî de bû:

-De hesab ke, terzîyek dikare bibe 'başqanê diyarbekrê'!

Huznê ew girt. Eleqeya Polîşanê a bo Sylvia Plathê dizanî... Wî jî helbest û mishefeke
Plath a pexşanî xwendibû. Fikir dihatê, newêribû fikra xwe ji xwe re bêje, digote xwe,
êz ê bi çi wêrekiyê wê fikrê ji Polîşanê re bêjim! Heke Polîşan bi pexşanivîsîyê re
eleqedar bûya, li gorî wî, her tişt hel dibû... Heya qatê şevê, li wê fikrê çûbû û
hatibû! Polîşan ew fikir qebûl bikira, pêşniyara wî a derheq mijar û movikên romanê
de jî amade bû:

"Nav: Dansa sor.

Karakterê sereke yê mêr; rojnamevanekî amator e. Di radyonekî niştecihî de vebêjerî
kiriye. Koçî Stembolê bûye. Wextekê bi karê rölîyefê re mijûl dibe. Rojekê lêzimekî
xwe dibe doktor. Nexweşiya lêzima wî pençeşêr e. Ew di her karê xwe de têk diçe.
Rojekê gotinekê bi bîr tîne, "wexta dil li ciyê xwe nebe îşê hişûaqil tune bila
biperpîte"! Li ser wê gotinê qerar dide, bi pey armonîkayê bikeve wê bibîne, a dilê
xwe bîne cî di karên xwe de têk neçe.

Karakterê sereke ya jin: Rojekê di destê bavê wê de mishef ji sahafekê tê. Di nav
mishefê de fotograf hene. Keçika wî jî pê re li fotografan dinihêre. Di fotografekê de
jinek heye ku bi sekna bidans e.

Şevêkê bavê wê wexta di sikakê de dimeşe dibe şahid ku çend ciwan pev diçin,
ciwanekî bi înyad êrşê keçikekê dike da wê bikuje. Hewl dide wî xortî aş bike, di
aloziyekê de xort bavê wê dikuje. Piştî mirina bavê xwe keçik binav mishefên bavê
xwe dikeve, navnîşana wê sahafê jî bi dest dixê. Pê re bi keçikê re hobî çdêibe, ew her
bi pey mishefên kevn yên bi notûnîşe, yên bin hevokan xêzkirî, yên rûpelên wan
hatine qelaştin dikeve."

Fesîh xwe bixwe got, te daber dilê xwe, baş e, tuyê li hemberî Polîşanê hew bikevî
dilqê qeşmerekî! Tu jî dizanî, dunya xirab be Polîşan dev ji dansê bernade...

Wexta li fikrên bo sêwirîn û mijara romanê fikirî bû meqes, pîne, qumaş, ta û makîne anîbûn ber çavên xwe. Ji alî teknîkî ve xem nedixwar bê çî mehne û têkiliyên xwe hebûn, sayakî got, nivîskarê baş mîna terziyekî baş e, heke bixwaze ew dikare bibe 'başqan'î! Eferimekê da xwe, dest bi karê xwe yê rojane kir...

Bi êvarê re sancî û bruyan ew gellek êşand, weke ku kêr di nava hûrê wî de biçê û bê.

Polîşan bêyî jê re bêje, xwe amade kir, rabe, em diçin nexweşxanê, got.

-Ez baş im, çiyê mi ji nexweşxanê heye!

-Destê te li ser dilê te ye, tu xwe tehl dikî, rabe!

-Îcab nake, got, rabû, çû li sarincê nihêrî, araq nemabû. Ez biçim araqê bînim, ê sancî û biruyan bide sekinandin. Nîyeta Polîşanê tunebû. Tu dizanî, got.

Fesîh derket.

Çû marketekê. Kasîyera ku li hemberî wî bi hurmet bû, hezkirina wê dida rûyê wê bi mişteriyar re mijûl bû. Fesîh ket dorê. Kesek li pêşiya wî bû. Fesîh li kasîyerê nihêrî. Şûşeya sîrkeyê ya zilam danî bû ser dezgeh ji alî jêr ve girt, pêş ve bir da ku kasîyer rihet bigire û bide xwendin. Zilam minminî, Fesîh nebihîst bê çi hate gotin lê kaîsyerê bihîstibû çimkî di wê kêliyê de hinarikên kasîyerê sorûmor bûbû! Ew jî soremorê hev bû, mafê wî tunebû dest bida alavên mişteriyekî din, ji hestiyariya bo kasîyerê ew rîsk girtibû, texmîn dikir bê gotinên derheq bênezaketiyê de gotinên nebaş hatibûn kirin!

Beriya wê li wê marketê carê ji kasîyereke din re gotibû bê çima cîhaza otomatîk alav pêş ve dibirin çima naxebite, bi gotina kasîyerê, marketê ji bo cî firehtir bike wisa dîzayn kiribû. Dor hatibû wî, kasîyera ku her carî bi hezkirin, tu bi xêr hatî digot, wê carê bi fedîkarî li pêş xwe dinihêrî, xuyabû keçikê xwe sûcdar hîs dikir bê ew bûye sebeb. Li gotineke îndîrekt geriya da ku kasîyer xem nexwe, gotin nehat bîra wî, bi bêdengî rahêşt alavên xwe û derket...

Pêşî minminî, wî teresî çî ji mi re got gelo, tamam, heqê min tunebû min dest bida alavên wî lê min dest neda serê şûşê, min dest neda nava şûşê jî, bo nebe bênezaketî, min bi du tiliyan ji alî jêrîn ve şûşê girt û pêş ve bir, bi îhtimaleke mezin wî ew hewla min nedît, heke dîtibe dîsa xwe qehirandibe ew nemirov e, ez ê çibikim... Wisa pê dihat ku wêrekî hatiye wî, ger wê wextê wî kesî bidîta teqez ê 'yekî li zêrçena' wî da û yeka din... Meşiya, zilam, kasîyerê wê kêliyê da aliyekî, xwe şermezar kir; ma bi te ketiye tu hewl didî alîkariya kasîyerê bikî, sipindî... Pê de çû, kûçî, hewtehweta te bû, te xwar, de here!

Ne li hemberî wê kasîyerê, wexta dexesî dibû kûçîk, di hundurê wî de deng bi xwe dixist wî bi nihêrîn, bi tevgerên germ an jî kubar yên li hemberî jin an jî keçên ku wî ew dinasîn hewl dida zikê kûçîk têr bike!

Çi cara fikra araqvexwarinê pê re çêdibû, sohbetek du sohbetên Polîşanê ên derheq vexwarina araqê de bibîrdianîn, Polîşan di wan sohbetan de sifra araqê, sohbeta xwe û mêrê xwe ya romantîk vegotibû, carê jî, bo mêrê xwe yê pêşî, me dev ji hev berda, ew gellek bi arîşe bû lê kesek romantîk bû, gotibû. "Ew gellek romantîk bû."Ew

hevok... Dengê Polîşanê yê wê kêliyê... xwêdanê Fesîh digirt, dibû mîna zarokekî, hewl dida heyfa xwe hilîne, hesta dexesiyê tatmîn bike!

Ew kiirna wî kirineke wisa bû ne mimkun bû Polîşan lê bikeve şikê çimkî li ber çavê jin û mêran Fesîh mirovekî cuda bû, ciyê wî kifş bû!

Di sikakê de bêhna du sê darên mêweyan, pisîka li erdê, kûçikê hildipekiya, bi avahiyên dîrokî re kêlîkekê bûn sebeb ew dîmenekê bisêwire; di dîmenê de ji hundur kesek derdiket, li ser wê cilûkincên tenik yên dirêj hebûn, bi bayî re wê dans dikir, porê xwe dixist halê pelgan...

Li xwe heyirî, di sêwirînê de a ku li ser wê cilûkincên tenik yên dirêj hebûn bi bejna xwe û bi çavên xwe dişibiya Leîla Bedirxanê! Hesteke biseyr dijiya! Heya wê kêlîkê Leîla Bedirxan bo wî fîgûreke pîroz bû, bi tenê hurmet, heyranî, girêdaneke bisirûraz mijar bû... Di wê sêwirînê de xwe weke xortekî ji sînemayê derketî hîs dikir ku aktrîsta di fîlmê de bi sehneyên romantîk mabe di hişê wî de...

Şûşa araqê a di destê xwe de bibîranî; ê ewê bibûya sebeb wîyê her tiştî ji bîr kira... Dengê kesek li pêşiya wî dimeşiya yê bilind bû sebeb ew xwe ji wî halî bike. Zilamê bejnbilind, gomlegekî golgolînê lê, digot:

-Do çendê Hezîranê bû, ha, do cineta temenê min bû, te bidîta, bêyî 'bikişîne' ketibû halekî wisa li ser bedena min dûman bi serê wê ketibû... Aniha hêdî dimeşim, şirîna xwêdanê ye ji mi diçe... Ezê ji te re her tiştî vebêjim, nepirse 'çi perçe' bû'... Na kuro, binêr, mi ti tişt jê re nedigot, hew mi xwe teslîmê wê kiribû, mejiyê mi vikûvala bû, ewqas!

Guh li min ke, ez ê biçim berber. Pey re ez ê bikevim çarşiyê, min ê bigota, dû re em hev bibînin, lê ewê zor be, baş e, belkî em ê du çay vexwin, li gorî pozsyonê, em ê hel bikin, baş e!

Fesîh li xwe werqilî ku di navbera wî û kesê diaxivî de qasî gavekê navber maye, xwe giran kir. Mîna di jiyana xwe de tiştêkî pir muhîm ferq kiribe hesteke cuda jiya; di nav nivînan de wî her hewl dida ew Polîşanê kêfxweş bike, gotinên zilam yên, min xwe teslîmê wê kir, di serê fesîh de kirin şîrqînî! Metelmayî mabû, gotin û peyv dihatin heta ser devê wî û diçûn, giş ji bo amadehiyekê dihatin ku ew biçê ji Polîşanê re bêje, na, got, duristî ne gotin û vegotina her tiştî ye, duristî ew e meriv bibe xwediyê xwe, meriv bihêle dildara merivan karibe ji merivan hez bike, zilam xwe teslîm kiriye, fehîşeyekê jidilûcan ji wî hezkiriye! Na, belkî jî zilam bi fîşalî diaxivî, teqez wî jî jinikê jî kinf kişandine!

Di nav jiyana rojane de, bi tesadifekê hay ji detayekê çêbûbû. Gelo sebebê ku ew romantîk nedihat dîtin tevgerên wî yên wisa bûn ku wî di hezkirinê de hewl dida fêdekarî bike? Di pevşadbûnê de jî hewla wî ew bû ew karibe Polîşanê tatmîn bike, li xwe werdiqilî, pirs ji xwe dipirsîn, çima ma kê li ser wî ferz kiribû ew bikeve nav hewleke wisa, li xwe mukir hat ku di pevşadbûnê de wexta wî ew hewla xwe jibîr dikir, beden bêhtir li Polîşanê tîn dida!

Gavên bileztir diavêtin. Nivîn, Polîşana ji bo pevşadbûnê amade dihat ber çavên wî.

Xwe teslîm dikir, hew dixwest hezkirinê bijî, bi pey hewl û îspatan nediket!

Tam di ber dara êweyekê re dibuhurî, bêhneke sivik ya xweş. Nêzikahî li malê kiribû. Li ser camekanên dikanekê afîşeke kevn ya fîrmaya otobêsekê:

"Dur-kalk yok

Rötar yok."!

"Derdê 'bisekine û biçê' nîn e

Rotar nîn e."

Sifra bi penîr û bi petêx, bi araq û bi qeşa û bi ava sar amade bû. Sê cûre jî xwarinên sar yên ji mast û hêşinahiyên amadekirî li ser sifre bûn.

Fesih li xwe, li halê xwe metelmayî bû, di zûtirîn demê de dixwest xweşhal be, xwe teslîmê Polîşanê bike! Hay lê bû ew xwestek û hewes jî mexsedek e, hewleke ne baş e, hinek ji bîr dikir, dîsa hişê wî ew aciz dikir! Diviya ew fikrên nebaş neanîba bîra xwe, halê bi hestên diguherîn nedihîşt ew bêtevger bimîne û zeman bihêle bo Polîşanê!

Polîşan bi heyecan bû. Wexta fesîh çûbû araqê bîne ew bi pirovayên bi lêdana armonîkayê re mijûl bûbû. Wê nîyetkiribû demek wisa bi hev re bijîn ku Fesîh karibe her tiştî ji bîr bike, dil û rihê xwe rihet berde, armonîkayê ne bi awayek nostalgîk û melankolîk, di wê kêliyê de weke amûreke mûzîkê ya wê kêliyê bibîne, bi dengê wê re bijî...

Tiştê ku Polîşan ne li bendê bû diqewimî; armonîkayek hêşîn di destê Fesîh de bû, ber bi devê xwe ve bir, paş ve kişand, li çavên Polîşanê nihêrî. Polîşan bişirî! Rabû ser xwe, bi tevgerên bi fîgurên dansê xwe amade kir, weke hêk di bin lêngên wê de bin, lingê xwe yê rastê bilind kir, mîna li erdê de û nexwaze hêk bişkên tevgeriya. Got:

- Lêde mîrzayê min, tu û armonîkaya di destê te, ez û xwesteka dansê, aniha hew ve bijî!

Reng li Fesîh çûbû, armonîkayê xist bêrîka xwe. Polîşan rahêşt qedehê qurtek vexwar. Tîrêj temîrandin. Qendîl pêxistin. Çû oda xwe ya xebatê. Li vegeerê fîstanekî gewez yê rihet û tenik li ser wê bû. Fesîh ji rûpela facebookê ya kesekê ev gotin jiber kiribûn:

"Kirasê wê tenik e
Ba lê dixê hinek e
Kirasê wê sor e
Dora wî bi mor e
Kê çav lêxist
Dawîya wî gor e..."

"Kirasê wê tenik e, kirasê wê sor e." Di hişê wî de çû û hatin.

Di destê Polîşanê de armonîkayek sorsorîn. Polîşan li armonîkayê dida. Fesîk metelmayî mabû. Dengê lêdana Polîşanê bandor li wî dikir. Bi halê şokbûyî pirsî:

-Ev ji ku derket? Tu û lêdana armonîkayê? Li derdora xwe nihêrî, gelo deng ji amûreke mûzîkê an jî ji kompîtorê derdiket? Na. Polîşanê lêdida?

Li aliyekê heyirîn, dengê xweş yê armonîkayê, ew dem bi demê diçû wexta berê û diaht li alî din jî tirsekê ew zevt kiribû wisa pê diaht wê kêliyê Polîşanê ew ji rabirduya wî dikir, tebatî nediketê, hêrsê ew digirt, li ser hev raq vexwar! Polîşan hay ji neçriya wî hebû, bi rik bi ser wî de diçû bi lêxistina armonîkayê û bi newayên hestiyar!

Xwêdan bi ser Fesîk ketibû. Bes e, got!

Polîşan xwe serkeftî hîs kir, hêvî pê re çêbû, bertekiya Fesîh ne bertekiyek sert bû. Hewla xwe, têkoşîna bo lêdana armonîkayê ji Fesîh re vegot. Li bendê bû Fesîh wê ramûse, Fesîh li wê dinihêrî. Hew dinihêrî. Çavên Leîlayê hatin ber çavên Fesîh. Ji halê xwe tişt fehm nedikir! Leîlaya ji bo wî pîroz bû çûbû, Leîlaya hunermend bi bedewbûna çavên xwe hatibû, ji alî hesta mêranîyê ve ew sor dikir, Fesîh bi zorê xwe kontrol dikir. Polîşan mehne li wî nedigirt, nedixwest hêviya xwe a bo şeveke romantîk ji dest bide. Armonîkayê danî erdê, çû cem Fesîh, dest xist nava porê wî. Wexta xwe teslîmkirinê bû, xem û tirsê Fesîh girt bi awayek bêmehe; ger sancî û birûyên wî ji nexweşiyê giran bûya? Ew bimira ê Polîşanê çi bikira?

Xwebixwe got, pê de birî, tam wexta fikir û xemên wisa ye, kertiya te dîsa bi te girti ye! Polîşan ne bi wê nîyetê bû rê bide halê zarokane yê Fesîh û ew jî dîsa bikeve dilqê dayikekê da ku Fesh têxe xeweke şîrîn, bo pevşadbûn û heseteke xweş ya şevê hêvî pê re nemabû. Dikarî zemanê xwe bo xebat û sohbetên derheq xebatê de bikira kêliyên xweş yên bi hêvî ne wisa ba ê peyder pê hin xwî û tevgerên Fesh piçûk bidîta bi wî awayî gotinên rexneyî li fesîh bigirta bê ew çawa maye di navbera rabirdû, edetên ji cîwarên bejahiyê de...

Wext derbas dibû. Fesîh ne li ser xwe bû xwe teslîm bike hey diçû ew serxweş dibû, diket dilwê kevirekî! Ya Fesîh dikir protesto bû, mîna jîjo xwe dikişand qalîkê xwe an tiştêkî din bû Polîşan nedizanî. Di nava rojê de li ser dîkileke di nav mishefeke kevn ya ji sahafekê kirîbûn nîşeyek wisa dîtibû:

"rp. 100. Xwendevanê reben, niha çawa aciz dibe."

Li paş heman dîkilê bi tîpên hûrik, bidestnivîsê wisa hatibû nivîsîn:

"Jiyan ew tragedya nepixî ye ku, bi destê nivîskarekî ji rêzê, bi awayek sayakî û bêserûber hatiye nivîsîn. Di dewsa meriv di qoltixê de xilmaşî be, gazin ji tamsarkîbûna mijarê bike, lîstîkvanan bènirx bibîne, sekna wan vêl bihesibîne meriv tinazê xwe bi wan bike, wan bi kîrê xwe 'say' bike, bifîkîne, di destê meriv de bacanên sor yên rizî meriv biavêje dikê belkî çêtir bû..."

Polîşan parçeyek qalîkê petêxê avêt ser sîngê Fesîh got:

"Rabe, biçe razê, xewa te tê!"

Fesîh li saetê nihêrî, wext zû bû. Sorûmorê hev bûbû. Nedixwest hêrsa xwe biavêje derve. Bêdeng ma. Polîşan dubare kir:

-Xewa te tê, biçe razê!

-Xewa min nayê. Te ew dengê armonîkayê bi min da ji bîr kirin, dikim nakim, deng bi wî awayî nayê bîra min! Te çi kir Polîşan, te çi bi serê mi de anî!

-Çi xweş. Fesîh, çi xebereke xweş e. Ew keda min da, hewla min bi avê de neçû!

-Tu henekan nakî, ne?

-Na.

-Te agir beredaye canê min, tu li ser çi kêfê yî!

-Ê te jî ne henek in, ne?

-Na!

Polîşan ji nişka ve dest avêt sifrê û kişand, bi hêrs diaxivî:

-Binihêre, ne henek e, rabe û bicehme! Ehmeqê bêîrade!

Xwîn bi awayek wisa di rehên Fesîh de tê de diçû û dihat Fesîh hewl dida rehên wî serttir bin da ku xwe zevt bike! "Bicehme." Ew gotin bi wî weke telaqberdanê dihat! Rabû, li benda lêborînê bû, deng bi Polîşanê nediket.

"Xampolî!", "Polî!", "Polîşan", "Polîhan" herçar jî weke nav li wê mabûn, navê wê yê esas Xampolî bû ku kalikê wê lêkiribû. Pey re li ser îtirazên hin kesên malbatê weke Polî hiştibûn, pey re bo navekî girantir be, şan lê zêde kiribûn, navê wê kiribûn Polîşan! Polîhan jî ji mêrê wê yê pêşî mabû jê re ku wî kesî "Polîşan" li gorî xwe weke navekî ecêb dîtibû, ji Polîşanê re gotibû, 'ger bi te jî baş be ez dixwazim ji te re bêjim, Polîhan ku ew ê li ber dilê mi şîrîntir be, Polîşanê li gotinên wî neketibû şikê, tişt pê nayê, gotibû.

Polîşan, 'navûbernavk' anîn zimên û li xwe kir qêrîn:

-Tu çi dijî? Li pey çi yî? Bi nav deftera biwêjan ket, biwêja "Heya xwe nas kir emrê xwe xilas kir." Xwend, çav lê şil bûn. Rabû, ber bi kelûpelan ve meşiya. Pê li ciyê şil kir, tîşortê Fesîh bi ber çavên wê ket, ew girt avêt ciyê ji araqê şil bûbû.

Bi nav kelûpelan ket.

Materyalên ku Fesîh bo Polîşanê dianîn(lîsta mishef û materyalên Polîşan bi destê xwe li wî bajarî bi dest xistibûn her di destê Fesîh de bû, mishef û materyalên nû ger hebûna Fesîh ew dianîn, Polîşan hew dixebitî), yên Polîşan bi dest xistibûn, Polîşan ji wan mishef û materyalan nîşe girtibûn.

Ew ji xeyalên ji bo koreografîyê bêhtir bi têma û stîlan re eleqeder dibû. Ji alî mît û efsaneyan ve, ji dunya bi sirûraz re, xwe bi hêvî dikir. Wexta dixwend her dianî bîra xwe dunyaya bi sirûraz hukum li dansa Leîlayê kiriye, xwe bişens didît ku di piçûkaniya xwe de wê jî mîna Leîlayê guhdariya çîrok û destanên heman çandê kiriye.

Li çavên Leîlayê dinihêrî Polîşan, çavên reş, çavên zeytûnî, mîna dunyayek nêz û gellek dûr pê dixuyan...

Polîşan, hedef datanîn pêş xwe, dest pê dikir, ew di nîvî de dihişt xwe li armanceke din digirt. Lêkolînên wê yên derheq Leîla Bedirxanê de jî lêkolînên nebirêkûpêk û bi detay bûn. Hin agahiyên sayakî yên di qada înternetê de, fotografên Leîlayê û hin agahiyên derheq Bedirxaniyan de, hewqas! A ku dibû sebab Polîşan hewqas bibe heyrana Leîlayê ew bû ku Polîşan, Leîlayê jî weke Zînê, Zîna Zêdan heya welatê xeyalên xwe dibir, ew li wir ji nû ve bi rih û bi can dikir, Leîla Bedirxana wê jî hebû! Bi wî awayî xwe têrûtije didît derheq Leîlayê de. Fesîh rojekê mishefa Leyla Safiye a bi navê, "Leyla, Çîroka Pirenseseke Kurd" jê re anîbû. Bûbû kulpîna dilê Polîşanê. Li ser hev sipasiya Fesîh kiribû, ew maçî kiribû. Herûher li fotografê Leîlayê yê li ser bergê nihêrîbû.

Her hewl dabû rûpelên mishefê vebike û bixwîne metirsiyê ew girtibû; lê ku mishef bibûya sebab Leîlaya di dil û hişê wê de xisarê bibîne! Mishefê bêyî bixwîne xistibû nava teregên mishefan. Fesîh wê mishefê her dixwîne. Polîşan rojekê jê re got:

-Eman ha, tiştên dixwînî ji min re nebêje! Fesîh guh li şîretên wê kiribû, bi tenê, carê jê re got, wê wextê gellek kesan ji be rkarê dansê gef li Leîlayê xwarine jê re name şandine!

Ew gotin bûn sebab hurmeta di dilê Polîşanê de zêdetir be.

Rahêşt wê mishefê. Li fotografê li bergê nihêrî. Aliyê bi teys yê kostumê weke gurgureyê xuya dikir. Aliyê pêşê li erdê bûbû keviyê bahrê, ji ser çongên wê de sûlav ber bi keviyên kostumê ve diherikî.

Ji bo mihteşemiya dansê xwe qanîh dikir, xwe bi xwe, sêwirîn û peşnûmayên kostuman bes e meriv bi heyecan û bi xirûr be.

Mishefê nexwend, nizanibû kîjan rojê bi çî hawî ew ê mishefê bixwîne!

Ber bi mishefa Nilgün Marmarayê ve çû. Mishefa derheq Sylvia Plath de weke tez hatibû nivîsîn gellek bandor li wêkiirbû. Carek din xwendina wê mishefê fikreke baş bû yan na, jê ne bawer bû. Rawestiya. Li şûşeya araqê a ku li erdê bû nihêrî, qurtek araq tê de mabû, rahêştê ew vexwar.

Ji mishefê ev gotinên Sylviayê xwendin:

"... Jiyana li ku bû? Bi rewşa berbelawelî, tune dibû û wexta jiyana mi dihat wezirandin kê mî xuya dikir, çimkî ne xwedî sêwirîna romaneke amadekirî bû, çimkî mi nikarî li ser daktîloyê bi behremendî û bi hêza vîna xwe romaneke tîr û xweşraz binivîsanda. Min ê bi çî, seba çî, ji ku de dest pê bikira? Di jiyana min de bûyereke bi qasî bîst rûpelan dagire hema bêje tunebû..."

Bi awayek felçbûyîrûdiniştîm, bi hîsa ku li dunyayê kesek tune pê re biaxivim, bi tevahî dûrî mirovan, di hundurê wê vakûmê de ew berhema min bû. Her diçû min xwe xirab hîs dikir. Bi tenê bibûma nivîskar ez ê kêfxweşbama û nikairbûm bibama nivîskar. Bi rûnişkandinêre min nikarî hew hevokekê binivîsanda. Ji tirsê matesar bûbûm..."

Polîşan xwe bi xwe got;

"Hûn çî qelemên mihteşem bûne ku we karibûye bang li ruhê bi hezaran, sedhezaran, belkî mîlyonan mirovan bikin... Ew hal aniha halê min e ez tê de me. Ez jî nikarim binivîsînîm. Dans. Ez û dansê em ê çî ji hev bikin, ez bi wê jî nizanim. Bi tenê me. Tikûtenê! Herçî Fesîh e, ew ê jî çiqas hewl bide bibe av pê re bibe hewrê reşûtarî û bibe laser her tiştî bide pêş xwe, wekî mêrê min ê pêşî, ew ê bibe laser, xwe bispêre heybeta hest û girêdana xwe... Nîyeta min tune ez bibim qirşûqal, ez darek im, ka heya ku..." Çû, derê odê vekiribû. Pişîna Fesîh bû. Li ser piyan ma.

Xemgîn bû, hin hal û seknên fesîh dişibandin hal û seknên ehmeqan, kenê jî dev jê bernedida; ew halê bi sir dibû sebab Fesîh bi gêjekî tevbigere! Heke fantezîyên Fesîh hebûna, fantezî tunene, digot Polîşan xwebixwe! Êşê dide pêş, dike ku di nav êşê de wenda be, bisernakeve. Xwe tawanbar hîs dikir, hewl dida gunehê xwe bi xwe bîne, bi wî awayî wekî kesekî "maqûl" yê bi xwe dizane bimîne!

Polîşan çû oda rûnişkandinê, xwe li ser qenepê dirêj kir.

“Tu bimirî, tuyê çi bikî”!

Beriya saetekê, ew gotin ji devê jina wî derketibû. Polîşan, dil kiribû biqîre ser, pê re pevbiçe:

“Tuyê bimirî... Ji te re dibêjim yan ji kevir re, mêrik, tuyê bimirî... Ji kerê rikê peya be... Biçe doktor...”

-Ez ê bifikirim.

“Ka li van hevokan binihêre, hevok yên te ne; Ez ê bifikirim... Temam... Tu mafdar î... Wisa ye... Reng e... Ka wê çi be...”

Ne ji Polîşanê bûya belkî wê ji bo mirina xwe xem nexwara, mîna ew û jiyane li hemberî hev zînakar bin, ji jiyane nefret dikir wê wextê!

Di berbangê de şiyar bûbû, anîbû hişê xwe, ya baş ew bû ji jiyana Polîşanê derketa, serêxwe hilaniya û biçûya; nedikarî alîkariya Polîşanê bikira, ne jî weke wê li jiyane dinihêrî, ez li ku ew li ku, bi dilşewatî ji xwe re gotibû.

Arşîva wî ya di kompîtorê de hatibû hişê wî, xwe bi xwe gotibû:

-Çi arşîv e dişibe sergoyên dewleteke dîktatorî; tu bi nav kevî bi salan incex tuyê karibî bisenifînî!

Wextê Polîşan berhemên edebîyata dunyayê dixwendin, wî wextî Fesîh di kompîtorê de dosya li ser dosyayê zêde dikirin. Lîsteyên peyvan çêdikirin. Nîşe û bîranîn tomar dikirin.

Ji berbangê heya tav li cîwarê şîrîn be Fesîh oda rûnişkandinê paqij kiribû, hewa bi hundur xistibû, taştîyek xweş amadekiribû, mabû li benda Polîşanê. Polîşan çawa ket hundur, hinarikê xwe amade kir da Fesîh ramûse. Fesîh xwar bû, ew ramûsa.

-Ez Leîlaya te me!

-Tu her Leîlaya min bûyî... Polîşan, ez ê biçim welêt!

Dengek ecêb pê ket:

-We... çi? Te go welêt? Henek e, tu baş î, ne?

-Polîşan, ez ê biçim welatê xwe!

-Hêdî, em ji hev fehm bikin, rewşa te ya derûnî ne baş e, ji alî hestiyarî ve tevlihevî heye, tamam, ev giş dibin sebab tu tengezar bî, lê, sebab... ji min re sebebana bêje!

-Dixwazim biçim...

-Ruhê, xuya ye, tu ji zûde ye, li dû pîlanan bûyî, ev jî min diêşîne, yê li hemberî min ne Fesîh e... Sebeb, sebebê çuyîna xwe bêje, bêyî ku tu atmosfereke nostaljîk, hestiyar û heta melankolîk biafirînî, bi carê, ji cî de bêje!

-Melzeme, ez ê ji bo melzemeyan biçim welêt!

-Tu naçî doktor... Mîna xewnên şeva ye, bawer nakim; çend sal in, bi carekê be te nehişt em biçin welêt, vêca tu dibêjî, ez ê biçim welêt! "Ez", yanî tuyê bi tenê biçî, hi? Ji bo melzemeyan; her dever tije melzeme ne, bi rêya înternetê tenê tu dikarî têra dilê xwe melzemeyan bi dest bixî. Na, ev ne sebab e, tu ji halê min aciz bûyî!

-Hestiyarî û melankolî tunebû, ne?

-Mîna felaketeke suriştî bi ser min ve hatibe, nizamim; min xeyal kiribû ku em ê ji alî dîtbarî ve dîwarê li hember bisêwirin, ne yek sê heb wêneyên Leîlayê hilawêsin. Heta min dikir ku em wek proje bi dû bikevin fotografên orîjînal bi dest bixin. Jiyana dê û bavê wê ji nû ve lêbikolin, detayên jiyana wan ya hunerî derxin meydanê. Tu ketî hundur, dibêjî, ez ê biçim welêt!

-Fikrên te xweş in. Ev fikir çi wextê hatin te?

-Bi şev, piştî tu çuyî ez gellek bi hêrs û bêhêvî mabûm, li çareyan geriyam, di nav nivînan de ew fikir hatin mi.

-Tu bi tena serê xwe rihettir lêkolînan bikî. Ez ê jî biçim welat, li wir hem terzîtî bikim hem jî karê berhevkarîyê bikim. Heke fikir û tiştên kêrî te bîn hebin ez ê bigihînim te.

-Tu naxwazî ez werim!

-Na!

-Belkî jî...

-Polîşan, got, ber bi wê ve çû, ew hembêz kir, destê xwe di bin gomlek re bir ser betanê wê, li ser hev, bi lêvên wê ket. Kir ku ramûsanê bide hêlekê çî henaseya ji can û cîgerên wê tê bikişîne hundurê xwe ku heya bifetise, li ber lingê Polîşan wek meYTEK bimîne. Ji hevdu têr nedibûn, hembêzkerin, maçîkerin, şidyatir hembêzkerin bi halê ji xwe çûyî maçîkerin...

-Bêje min!

-Çi bêjim?

-Bêje, ez diçim welêt!

Fesîh go:

-Ez ê biçim welêt.

-Çi xweş! Bo melzemeyan?

-Belê, got, nikaribû halê fedîkariyê veşêre, pê deçû, bi tneê ne melzeme... Te digot, îsrar li hin ciyan dibe sebebê êşê!

-Baş e...

Li ser taştê, di nava rojê de li hev kiribûn ku ê ti qerar negirtina ji bo demekê, ew ê Fesîh biçûya. Li gor qewimn û geşedanan an ew ê ji hev biqetiyana an jî dewam kirina...

Fesîh li ser înternetê bilêt kirî. Dosya xwe ya taybet ji maîleke xwe havête maîla xwe ya din. Hemî arşîv û dosya havêtin "flaş disk"ê.

Fesîh heya derengî şevê li ber kompîtorê bû. Polîşan mishefa ku nivî kiribû, bi xwendineke sayakî qedandibû. Çûbû li pêşberî dîwêr sekinîbû. Bi hewakî deng li Fesîh kiribû:

-Şev baş.

-Tuyê ranekevî?

-Karê min heye.

-Baş e, bi xweşî be.

Qedehek vîskî vexwar. Ber bi ref ve çû, fotografên xwe û yên Fesîh derxistin li wan nihêrî. Poşman bûbû, xwezî weke nîşe bûya jî jiyana xwe û Fesîh qeyd kira. Fotografek dikarî hew qasî tablo bianiyan ber çavên wê ku bi nivîskî ba wê çî pêşkêş kira. "Na" gote xwe ji nişka ve, bîranînên rabirduyê ne hew qas mehsûm in, destê meriv ji jiyana rojane dikin, piştî wextekê însan wan bîranîna disêwire, dike wek berek devkî bêhay dibe çîrokbêj û guhdara 'çîrokên xwe', fikirî, bi deng got, dans, xwezî aniha min li ser dikê dans bikira, weke Leîlayê... Çavên xwe girtin, halê xwe yê li ser sehneyê xeyal kir. Dengê temaşevanan dihate guhên wê:

"Polîşan! Biravo!"

Li pey dengê nasên wê:

“Çi beden e, li ber çavên meriv dibe deng, dibe newa, dibe tablo”

“Bedena te mîna hevrişîmiyê ye.”

Polîşan vedigerî, ji wan re digot:

“Wextê dans dikim hewl didim ruhê wê keybanûya muhteşem, ruhê Leîlayê hîs bikim... ‘Leîla kî ye?’ ‘Leîlaya min e.’ Leîla çi ye? Leîla henaseyeke hunerî ye.”

Li pêşberî dîwêr, wek fersendekê bi dest xistibe ku karibe yek bi yek reng û dengê jiyane yê rabirduyê bi bîr bîne, cî da xwe. Vîskî vedixwar.

Gote xwe, pîrbûna stêrkan nîşana eşqan e, bi qasî stêrkan eşq hatine jiyîn yê dixuricin eşqên dema me ne... Roja ku dilê wê ketibû Fesîhî wê rojê li ser hev fikrên cuda bo dansê hatibûn wê yek jê jî tomar nekiribû... Hinek nihêrîn dişibin pîrsan, heke bersiv nehatibe girtin însan aciz dibe her dixwaze bipirse. Polîşan bi wî halê bêbersiv hey dixwest li zîlam binihêre, zîlamê bejn dirêj, bi biriyên reş, çav lê fireh “bi carekê” hukum li Polîşanê kiribû.

Wê rojê wisa bawer kiribû ger ew û Fesîh bibana dildar pey re bibana mêr û jin ê di dansê de serkeftî ba, navûdengê wê belav bûya...

Çi bûbû, çi qewimî bû? Bila Polîşan bi hestê xwe re, bi xeyalên xwe re, li hemberî dîwarekî, li rengên jiyana xwe, li çîrokên bedena xwe ya bedew, li rengê dilê xwe yê gewr bifikire... Em ji cihekî de dest pê bikin. Heya cihekî vebêjin. Ne pêşiya çîrokan heye ne jî dawîya vegotinê.

Fesîh dikana xwe dewr kiribû. Beriya dewr bike têlêfonê kirêciyê beriya xwe kiribû, zilam bersiv nedabû wî. Li ser wesêta wî zilamî, Fesîh alav û kelûpel biirbûn 'bit pazari'yê. Bo çûyîna Fesîh tu astengî nemabû. Ji Polîşanê re got:

-Ez ê şîfra blogê neguherim, tu serbestî weke bikarhênerê blogê tevbigêrî.

-Zor e, dîsa jî sipas bo te.

Li pey wê dîyalogê zorê li hişê xwe kiribû gotineke herî xweş bi bîr bîne. Wexta xatir ji Polîşanê xwestibû jê re gotibû, tu dişibî 'gula li ser takî hêşînbûyî! Polîşan li hemberî gotinên wî kilama Rojdayê ya bi navê, "Tu şîrîn î." Bi bîra wî xistibû! Pey re jê re gotibû:

-Bi awayek azad bijî, xweş bijî, têkiliyên me her çîbin tu mirovekî delal î hezkiriyê mi!

Fesîh ji gotina "hezkiriyê" min ya bi darblêdan peyam girtibû,

Ew jî ne li bendê bû da Polîşan jê re bêje 'mêrê mi', roja pêşî Polîşan gotibû, em ê bibin mêr û jin lê rojekê te hey dît ez û tu bûn weke mêvnê hev an jî weke em kêlîkekê li kafeyekê rûniştibûn û karibin bi riheî xatir ji hev bixwazin' Adetên civakî, awayê mezinbûna Fesîh, exlaq û seknên terzîtiyê giş bûbûn sebeb wê kêliyê Fesîh di bin wan gotinên Polîşanê de bihejiqe, xwêdan pê ke ve, dabû ber dilê xwe bê ew li ku dijî, li ciyê dijî jiyan çawa ye, heyra, ew jî li dera ha, ez aniha ji vê jinikê hez dikim, gotinek wê heye, ez ê bi gotina wê bikim, de diçe li ku disekine ew dizane, fikirî bû... Rojekê serpêhatyek bi serê wî de hatibû, bi heyecan ew serpêhatî ji Polîşanê re vegotibû:

"Li îstesiyona metroyê mi dest xist bêrika xwe ew kaxiz bi tevî du pereyên kaxizî derxistin, mi kaxiz vekir xwend. Kesekî nêzî min bû go, ez werim alîkarî bidim te em

pereyên te bijmêrin, ez keniyam, ew ber bi mi ve hatî go, gerek meriv jiyane mezin neke, i gotê:

“Mi li keştiyê not lê kiribûn, mi mereq kir bê ew kaxiz hê di bêrika min de ye an na.”

Di wê navberê de mi pere xistin bêrikeke xwe a din, kaxiz xist heman bêrikê. Zilam go, ji mirovekê pirsîne, azadî çî ye, wî gotiye, azadî ew tişt e ku meriv heman xeletiyê dubare neke. Mi gotê, ji kerema xwedubare bike. Go, mêrik gotiye gerek meriv heman xeletiyê dubare neke. Mi gotê:

-Bêrika ku mi kaxiz xistê nêzikî dilê min e!

Li mi nihêrî. Poşetên li erdê rê mi da, go:

“Li ser sergoyî du poşet tije nan û xwarin hiştibûn, ez wan dibim bo ajalan.”

Mi gotê:

-Çî xweş.

Derî vebû, mi ling avêt hundur, wî hewl da were bi mi re li heman vagonê siwar be, pey re mi li derdora xwe, li paş xwe nenihêrî bê ew nêz e an na... Carek du carên din mi ew kaxiz derxist, hevok xwendin, cara dawî mi gote xwe, divê meriv hintiştan mezin neke, heman xeletiyê dubare neke!”

Gotinên zilam dubare kirin:

“Meriv hin tiştan mezin neke, heman xeletiyê dubare neke.”, baş e, gote xwe... Hewesa xwe anî da ew li qeraxê bahrekê bibûya zinarekî, her pêl bi ser wî de bihatana û wî dengê armonîkayê bibihîsta... Na, gote xwe, li geliyekî ez bibûma dara spîndarê, min ê her xwe li asîman bigirta, di wî gelîyî de çî teyrûtu hebûn bihatana li ser guliyê mi danîna... Îskînî... Gotinên Polîşanê bi bîr anîn, wexta ew wisa hestiyar tevdigeriya Polîşanê jê re digot, bangî aqil ke bila serî ji xewê rake, nehêle hest wî zevt bike! Bişirî...

Di heman rojê de li welatê xwe, piştî walîz û çanteyê xwe birin danîn malê vegeriya, li çayxaneyekê çay vedixwar, hevalkeî wî yê lîseyê bi kêfxweşî li wî pirsî, Fesîh ew kerem kir, kes rûnişt, telefona xwe danî ser sehpayê pey re girt, pê re mijûl bû, fotografekî di bloga Fesîh de rê fesîh da û gotê:

-Roja ku mi ew fotograf di bloga te de dît, şîroveyên di rûpela te ya facebookê de xwendin mi jî qerar da ez li tişteki wanî bifikirim...

Heya wê kêliyê bo blogê têkilî bi kê re danî bû, çî şikil û stîl ecibandibûn bi Fesîh re par vekirin. Ji wir hat ser meseleya dengbêjiyê. Gotê:

-Beriya çendekî kesekî bi bernavk rûpela xwe ya facebookê saz kiribû bo dengbêjiyê gotinên balkêş kiribûn, gotibû, got, dest pê kir ji rûpela wî kesî xwend: "Di dengbêjiyê de deng merivan nabe xeyalan, deng dibe sebab her tişt li ber çavên merivan candar bibe, meriv bi heyecan bin, bi piranî nabe sebab meriv şîrove bike, pirsan bipirse, di wê kêliyê de meriv dijî û ji bîr dike, weke jiyanê..."

Romana Kurdî ger bibe sebab em li detayên wisa bifikirin ê baş be. Dengbêjî bi awayek rabirdu ye. Rabirdu, îhtimal e bibe lekeyek, bibe şop, sir, jiber, qebûl, deriyek, sikakeke teng, sikakeke bidawî, dafikek, heta bibe ew goristan ku mirî jê radibe..."

Gotinên dibihîst bi Fesîh ne gotinên pir basîtbana jî guh nedayê, derheq gundan, mirovan de pirs ji wî kesî dikirin, alîkarî ji wî jî dixwest bo karê berhevkarîyê. Behsa mişteriyên xwe ên meşhûr kir Fesîh, lê zêde kir:

-Ji alî pereyan ve xem nîn e, ez dikairm li vir hem karê terzîtîyê dewam bikim hem karê berhevkarîyê bikim hem jî ji bo hin mişteriyên xwe şewirmendî bikim...

Zilam weke ku bixwaze tecrube bike bê ka ew gotin rast in yan na, gotê:

-Ka tu dikana xwe vebike, teqez ez ê werim dikanê, em ê hê pir sohbet bikin...

Fesîh di dilê xwe de got, Xwedê neke, îja sohbeta pir, hindik lê rindik, têra mi bes e... Bo çay îşaret da garson, ji hevalê xwe re got:

-Ez bi te û bi gellek kesên mîna te bişewirim, projeyên mi yên cuda hene...

"Tiştê hûn bêjin ger ji bo we gellek muhîm be, di dilê we de ciyek xwe yê taybet hebe, teqez e ku hûn di xebatên xwe de weke av û av têk biçin." Ji çîroka bi navê Tonio Kröger ya Thomas Mann

Polîşan rojek du rojan bi nav malê ketibû, tiştên bêkêr avêtibûn, hewl dabû xwe, Fesîh, dansê ji bîr bike... Roja sisiyan, dest pê dike mishefa bi navê "Leîla, Çîroka Prenseseke Kurd" dixwîne. Wê şevê ranazê, heya destê sibê mishefê giş dixwîne. Bi xwendina mishefê re xwe jî xilas dike, wisa li xwe hêrs dibe, ji xwe re dibêje, te hel kir, te bi riza dilê xwe Leîlaya di dil û mejiyê xwe de kuşt, de here safî bike! Hinek radiweste, bêhna wê tê ber wê, bi çavekî din lê dinihêre, kêf tê wê. Xwe bi xwe dibêje, heya roja îro ez ew kes û reben bûme ku mi xwe xapandîye, Leîla xwe bûye, ez ne xwebûme, ji bo ez bibim xwe bi zanatî mi tu tişt nekiriye.

Riyek bo wê hebûya bibûya sebeb rojê nû ji bo wê hilbahata, ji ciyek nû de dest pê bikira, li xwe mukir dihat ku wê Leîlayê bo hewînî, xwexpandinê weke modeleke çîrçîrokî dîtiye, wê weke hosta di mejiyê xwe de bi cî nekiriye; hewesên malabata wê ya bo hunerê, çîrokên ku malbata wî derheq malabata Bedirxaniyan d eji wê re

gotibûn bûbû sebebe w jî di malbata xwe ya binavûdeng de bibe Leîlayek, mexsedên min feraseta mi kuştine min hay jê nîn e, difikirî, ji ber wê dans ji bo mi çiqas muhîmbûye, peh peh peh!

Li xwe mukir dihat, çî ferq di navbera min û kesên gef li Leîlayê vexwarine de maye, ez jî bi wî awayî, ji hêla xwe ve dansa wê tehdît dikim çimkî mi ne ew nasîye ne jî dansa wê! Xwe li hemberî nivîskara wê mishefê mihnetdar hîs dikir.

Ji bêxewbûnê serî lê giran bûbû. Rahêşt kaxiz û qelemê, çend nîşe lêkira û serî biavêta xewê:

1. Ji bo bikevim nava çîrokê gerek çîrokeke mi hebûya, çîrokeke mi heye ew çîroka wê kesê ye ku rebenek e, xwe her xapandiye!

2. Peroşên Leîla Bedirxanê bo dansê bûne peroşên mi bo Leîlayê bûn. Ez texlîdkarek basît ya erzan ya fotografan bûme!

Polîşan giriya.

Wexta çavên xwe vekir esra dereng bû. Polîşan pê ket çî fotograf, kelûpel û mishefên derheq Leîlayê de li cem wê hebûn gişk birin dan sahaf. Qerar girt ku terka bajêr bike. Ê biçê mekaneke wisa ku karibe çîroka dêw û keçikê bisêwire, li wir bixebite! Ez ê bibim xwe û vegerim, ez ê li wir ji bo xwe dans bikim, kir qêrîn; Polîşan dans e, Polîşan dunya ye!

Ew ê li rêveçûna keçika li pêş dêw bixebitiya ku li gorî wê, di her kêlikê de, ê keçik bi awayek wisa bi ser dêw de vegehiya ku ê pê re pencên wê bibûna mîna devî, kostumên wê bibûna mîna kevîr û zinaran û pey re ê zemîn bibûya mîna qeşa û ew ê her biçûya, pê re bişemitiya, li paş xwe binihêriya, bi tevgerên serkeftin li dêw binihêriya! Ez ê her li wan stîlan bixebitim her bixebitim, hîs bikim...

Di vîdyoyekê de fîgûr û stîlên lîska tirpankêşekî temaşe kiribû! Tiştê bala wî kişandibû bengîtîya bi wî kesêre bû, wisa dilerizî ew kes û bi tirpanê şax dida lîska xwe Polîşan bi heyranî lê temaşe kiribû. Dest û milê min, gewdeyê min ji yê wî tirpankêşî çalaktir bin, ez ê hîs bikim, ez ê hîs bikim, digot xwe bi xwe...

Di mishefa derheq Leîlayê de xwendibû ku Leîlayê gotiye, ez ji sîporên zivistanê hez dikim, wê kêliyê Polîşan gotibû, ez ê zivistana li pêşiya me biçim devereke wisa hem sîpor bikim hem jî li stîlan bifikirim û bixebitim, awayê hezkirina xwe ya bo Leîlayê biguherim. Di gellek mishefan de rola perwerdehiyê ya bo hunerê xwendibû, çi ecêb bû bo dansê ya ew bandor nedianî hişê xwe an jî wexta dianî pêxim pê nedixist, nivîs û nirxandinên derheq Leîlayê de eleqeya Leîlayê û perwerdehiyê, cidîyeta Leîlayê bûbûn sebeb ew li xwe mukir were, li pey zivistanê berî bide Parîsê, li wir hem perwerde bibe hem jî bi lêkolîn û keda xwe kitûmatên jiyana Leîlayê hîn be, belkî, rojekê jiyana derîyek li wê vebike. Wisa girîngî li wan fikrê xwe girtibû ji wê rojê de hesabên xwe yê medya civakî giş giritbûn, bi carekê be li bloga Fesîh mêze nekiribû, bêriya wî dikir, têlefona wî nedikir, carê berisv nedabû têlefona Fesîh, pey re fesîh têlefona wê nekir. Hin mişteriyên Fesîh yê 'meşhûr' di navberê de ew aciz dikirin, şewaza xwe jî guherî bû, bi yekcarî bi du peyvan bersiv dida, nizanim, rojbaş!

Zivistanê li Wanê bû. Li "têmaya qeşayê" difikirî. Piştî lêkolîn û xwendinên birêkûpêk haydarî destana Siyaben û xecê bûbû. Terîfa ciyê Siyaben lê miribû û Xecê xwe tê de werkiribû hîn bûbû.

Ji bo karibe li Sîpanê Xelatê, li ciyê hatî terîfkirin sîpor bike, stîlan bi dest bixe lêkolîn dikirin, têkilî saz dikirin. Di demên guncaw de, li berpalekî bi zinar yê bi bajêr ve, li ser berfê hewl dida rêveçûna kewa basklêşilbûyî candar bike.

Êvarekê li otêlê bi nav nîşeyên xwe ket. Di rûpeleke bi lekeyên qehwê de ev nîşeyên xwe xwendin:

“Biherhal bê dengên k udi mirovan de diman ew deng heya dara hejîrê dianî. Çîrokên bi te re mayî bi dengên bi te e mayî bi wan dangan re bişîne. Wexta biçim cem mirovan, biçim cem mirovên ez jê hez dikim gerek peyvên min hebin. Ew peyv ku wexta li ber lingên mirovan bireşînim bila bo wan bibin deriyên çîrokan. Dengê pelgên dara hejîrên têne min, dibêje, tu çûyî, li vir dengêkî bihêle, em ê dengê te tevî dengê xwe bikin, bi bêhna hejîran re bişînin, rêwitiya dangan ji xwe re bike çîrok, biçê welatekî dilan, tê gotin di çîrokan d eji zor e ku meriv karibe nav li hin welatên dilan bike...”

Li Siyaben û Xecê fikirî, li nîşeyên xwe fikirî, weke tesadifeke xweş pêşwazî kir çimkî ji kî pirsîbû destana Siyaben û Xecê bi tenê weke destaneke eşqê jê re behs kiribûn.

Roja mayî, li kafeyê, keçeke bi navê Porsor ji garson re got, ew xanima behsa wê têkiirn ew e? Garson bo Polîşan şikê nebe ser wan li alî derî nihêrî, belê got. Porsor li Polîşanê nihêrî, bi dengêkî bêmihtet got:

-Kurda spî, dibêjin ew jî hatiye ji bo dansa xwe çavkaniyan bi dest bixe li van deran digere...

Polîşan carê du caran nihêrînên Porsorê yên li ser xwe zevt kirin, mîna tiştê neqewimîbe tevgeriya, ji kafeyê derket, ket riya pasajekê da ku li wir mishefên derheq Wanê de bi dest bixe...

Havîne wexta li ser stîla keçika li pêş dêw xebitîbû gellek pêş ve çûbû, ew weke porjeyeke hêja di vîdyoyekê de tomar kiribû. Hêvî dikir ê li ser berfê, di rojên zehmet yên li Sîpanê de karibe biba xwedî stîl an jî fikrên muhîm.

Li Wanê herûher çîroka “Axtamara”yê bi bîr dianî, dikir nedikir nikarî ew efsane û dansê bianîna cem hev, jê berhemekê biafiranda...

Êvar bû. Sirûseqemê li ser bedena xwe wisa hîs dikir ecêbmayî dima, bedena wê li wir bi tevî bêhnê, lerizînê, bêtevgerbûnê, muhîmbûna tevgerê dianîn bîra wê. Li çayxaneyekê yekî jê re gotibû, xanim çay vebixwe bila xwîna te germ be, xweş bigere, tu nabînî bê serê pozê te çiqas sorûmor bûye! Polîşan, ji kalikî re gotibû, ez tîm cem te me bi hev re çay vebixwin.

Kalikî ji Mihaciriya Êris bigire heya wê rojê çî bihîstibû, çî dîtibû bi awayek kurt ji Polîşanê re vegotibûn. Li ser hev pirs ji Polîşanê kiribûn. Wexta Polîşan behsa malbata xwe kiribû zilam gotibû, kifş e tu ji maqûlan î!

Polîşan stîla mahr ya di dansa Leîlayê de bi bîr anîbû, ji zilam pirsî;

-Kalo, çî ajal dikarin mîna serê mahr bi dans bin?

Zilam heya qûtîka cixarê derxist, cixare pêça jî her digot, ajala ku mîna mahr karibe serê xwe bibe û bîne, niç, nayê bîra min, ez nizanîm tu çima dipirsî, got...

Polîşan bi du dilî tevdiageriya, ger bigota bo stîlên dansê ye nizanibû kesê kal çî bertekî rê bida, qet, mereq dikim, got, destûr jê xwest, heqê çay da, bi rê ket.

Rojeke sar. Çiya bi mij û dûman bû. Ew biribûn geliyekî wisa ku ger qewimînên nebaş biqewimiyên ew ê ji jor de bi rihetî bihatana rêya ku li keviyê golê bû. Ji Polîşanê re gotibûn, li vê lûtkeyê ber bi jêr binihêre, bîne ber çavên xwe ku ji lûtkeyê heya ciyê dûz kevir, zinar, dar û ber, devî hene, tu bisêwire bê Xecê xwe di ciyekî çawa de werkiriye!

Polîşan bi tevî pênc kesan ku ew kes yan xwendevanên zanîngehê bûn an jî zanîngeh qedandibûn, jê du heb bi edebîyatê re mijûl bûn, yek fîzyoterapîst bû, kesek mamoste ya din jî xwedîya weşanxaneyekê bû. Ew pênc kes û Polîşan gellek çaran hatibûn ba hev, civîn lidarxistibûn. Ji wan jê yekî, teklîf li Polîşanê kiribû da Polîşan li Wanê bimîne, projeyên xwe li wir bimeşîne.

Ji çîrokên şerûpevçûnan bigirin heya bûyerên li zanîngehan yê diqewimîn û geşedanên çandî yê li bajêr, folklor, çîrokên derheq hin kesên bi kinfê re mijûl bûbûn û nav dabûn... Polîşan gellek çîrok bihîstibûn di sohbeta bi wan kesan re. Zêdetir jî çalakiyên derheq edebîyata kurdî de bandor li wan kesan kiribûn ji wan çalakiyan bîranînên xwe, fikrên nivîskaran, coşa xwendevanan bi Polîşanê re par ve dikirin. Wexta dicoşiyên û digotin, filan nivîskarê me hêjayê Xelata Nobelê ye, Polîşan hay ji tîbûn û hewesa wan ya bêdawî çêdibû...

Ji wan jê du heb ji nivîskariya Yaşar Kemal bi gazine bûn bê çima wî bi kurdî nenivîsî bû yê din tevî fikrên wan nedibûn, digotin, Yaşar Kemal nivîskarekî mezin e, dema wî bînin ber çavên xwe, ya ku hûn dikin ne rexne ye, hêriş e, biçin li mishefên wî binihêrîn, hûn ê bersivên bo pirsên xwe bibînin! Em rexne li xwe bigirin bê çima em dibin sebê polemîkan, xwe li referansên nivîskariya wî nagirin...

Ji kesê bi edebîyatê re mijûl dibû, hewl dida pesnê çanda xwe, edebîyata kurdî bide, zimanê wî yê ajîteyî xuyabû hîç bala wî nedikişand, wexta diaxivî mîna sîyasetmedarekî bi tevger bû, tona dengê wî her diguherî. Nexşa derheq "donzde" yan de anî bîra her kesî bê donzdeh meh hene, donzde hewarî, donzde mele, donzde xwedawendên Hîtîtî, digot, mi di mishefeke derheq folklorê de xwendibû, paşayên kurda hewl dane zarokan xwe hînî donzdeh zimanan bikin...

Polîşan li hêlekê hewl dida li hemberî wan nazik tevbigere, li alî din gotin, vegotin û çîrokên derheq çiya de, yên di malbata wî de hatî gotin bîne bîra xwe, pê re têkilî bi çiya re deyne, hîs bike... Heya derekê xwe zevt kir, paşê bi lêborîn ji wî kesî re got: -Weke edebîyatvanekî tu ji mi çêtir dizanî bê tîrbûn, hin kêlî çiqas muhîm û sotîner in, bi destûra te, em êdî bêdeng bin, heya em biçin jêr...

Li gorî qerara ku dabûn ê Polîşan li pêş wan bûya, serdeberjêr her bireviya, biketa(tiştên cidî ne tê de), rabûya ê kesî dest nedayê...

Polîşan çavên xwe girtin, hewl da hişê xwe vala bike, xwe ji her metirsî, mexsed, bîranînê bike, ê ew wext bo wê bibûya ceribek muhîm, reviya, di nav mijê de li ser berfê, bi revê re qey hewa dibû kêr heya cîgerên wê diçû...

Çavên xwe girtin, xwe avêt erdê û gilêr bû... Li ciyekî rabû ser xwe, li ku bû ê bifetisiya... Destê xwe bir ser dilê xwe, ew tevger kir ku weke bi pencikan rahêje dilê xwe, wê derîne, weke çûkekê serbest berede... Destekî ew tevger dikir, dor dihat destê din, radihêşt dil, ew derdixist, dil bi furê diket dor dihat destê din, weke sêrbazekê bû, dilên wê xilas nedibûn, dilek diçû dilek din dihat, wê çiqas dixwest bi çûyîna dilekî re jiyane dilek din dida wê... Detsê xwe diavêt dil pê re êş dihat, dil weke çûk serbest berdida kêf û xweşhaliyê ew digirt pê re jî hewl dida tiliyên wê hem bibin pençe hem jî bibin bask, dest diavêt dil, dil derdixist, ew ber dida dil difuriya, dor dihat dilekî din, di dilê xwe de ew hevok dubare dikişandin Polîşan:

-Destê xwe dixim dilê xwe, derdixim, li ser destê xwe dilê xwe dikim çûk û serbest berdidim, dilekî din dikeve bedena min, dor tê wê...

Bi kêf bû, kir qêrînî:

-Polîşan, ji te hez dikim keçam, bifure Polîşan, bibe periyêke dansê!

Êvarê li ber tîrêja qendîlê li dîwarekî vala nihêrî, gote xwe:

"Aniha, her carî destê xwe dixim dilê xwe û tiştêkî jê derdixim... Çîrokeke ew qas kurt e çîroka min... Dans, wêne, deng û çîrok... Her yek jê bi qasî hevokêkê kurt ya di dilde ye..."

